

Sal:2 Hejmar:59 4-10 Nisan 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyi

Qatilê
du xortên
Kurd
beraet kir


Rûpel 5



Di riya yekîtiya neteweyî de Gaveke girîng

Civîneke dîrokî bi bang û pêşkêşıya PKK'ê, ji aliyê partî û rêxistinê Kurdistanê ve li Şamê tê li dar xistin

Rûpel 8



DERHEQÊ EXLAQÎ DI ÇEND QISEY

"Normê exlaqê serdest û kolonialîstan hînî welatê ma di, hezey verê bi hêz niyi. La belê hetanî Kurdistan a-zad nêba, ma tesîranê exlaqê kolonialîstan ra nêxelesenî."

J. Espar nivîsna

Rûpel 6



'KLAMEK JI BO BEKO' XELAT STAND

Filma 'Klamek ji bo Beko', di Festîwala Film a Strasbourgê ya Navneteweyî de, di beşa pêşbaziyê de hate pêşkêşkirin û Xelata Jurî ya Taybelî stand. Festîwal, di mîjuya 18-28'ê Adarê de li bajarê Strasbourgê, ya Fransa li dar ket.

Di rûpela 11'an de bixwînîn

Ji mele û şêxan re

Di dîroka Kurdistanê de, yên li hemberî dagirker û xwînmijan, ji bo azadî û rizgariya gelê Kurd. serokatiya serhil-danan kirine, gelek jê mele û şêx bûne. Wek Şex Sejd. Şex Ubeydullah, Seyîd Riza, Mele Ehmedê Cizîrî, Mele Ebdu-rehman û gelek meleyên we-kî wan. Keda van kesan di serhildan û şoreşê de heye. Di vê demê de ji, gelek meleyên kedkar û welatparêz hene.

Geli meleyan! Ez dixwazim ji we çend pirsan bikim. Wex-ta ku me çavê xwe vekir, me Quran nas kir. Ji dema ola islamê ta niha, rewşenbîrêñ gelê Kurd pîrî wan mele bûne.

Hetanî iro we tu "ronahî" neda gelê Kurd. Meleyên ol-perest ên dewleta xwînmij û dagirker, hemû xebatêñ xwe ji bo gelê xwe kirin. Ji meleyên Kurd re ji digotin, "Em birayên hev ên misilman in." Baweriya me ji bi biratiya wan hatibû. Em dixwazin ku, em û hemû gelên dinyayê birayê hev bin û mîna mirovan bin. Biratiya bi hev re ya rastin, tiştekî pîr bedew û qenc e.

Em dinêrin, dûgela (dewleta) dagirker li ser bajar, gund û li ser gelê me bombeyan di-

barîne, malan dişewitînin, gundan vala dikin, dest di-avêjin xwiş û dayikêñ me û li metropolan ji êrîşî ser gelê me dikin. Dema ku em ji wan misilmanen dûgela (dewleta) dagirker re dibêjin: "Di misilmanî û di ola İslâmî de zilm û hingavtin tune. Misilman li hemberî zilma kafiran derke-tine, werin em ji li hemberî zilma dagirker a ku li gelê Kurd dibe derkevin. Em demek birayên hev ên misilman bûn." Meleyên dagirker di-mizgeftan de dibêjin: "Xwedê bi artêşa me re be." Ew ji ali-kariya vê qirkirin û zilma dewleta dagirker dikin. Ango em ji wan gelê dagirker re, yê ku em bi biratiyê xapandin, dibêjin, em birayên hev ên misilman û wekhev in. Lê ew biratiya wekhevî qebûl nakin. Dibêjin: hûn ji me re koletiyê bikin, emê we bi birati qebûl bikin.

Di dîrokê de hetanî iro, du-gelên (dewletêñ) dagirker em bi olê xapandin. Di dema iro de, dagirker li hemberî rizgarî û azadiya gelê Kurd, ketiye tengasiyeke pîr mezin. Li diji vê tengasiyê wek dema "A-laheyen Hemîdi" ji xwe re noker û cahşikan çekirin. Dixwazin dîsa mîna dema "A-laheyen Hemîdi" bi nokerî,

cerdevantî, xwe li ser piyan bihelin û me bixapînîn.

A dinê gelê Kurd bi misil-mantiyê ve pîr giredayî ye. Dewleta dagirker xwe kir şeklê misilmanan û li ser navê hizbulah mirovîn me xapan-din, dîsa bi navê olê.

Dewlet û hizbulah bi hev re rabûn û bi hev re êrîşî gelê me yên demokrat û welat-parêz kirin, ew qetil kirin û hîn ji dikin. Ew kesen ku kîfa xwe ji hizbulah re bîne û ali-kariya wan bike ew ji dibe şîrîkê wan qetilkar û xwînxwaran. Hûn mele ji pê dizanin û bi çavê xwe ji dibînîn. Iro, di vê demê de, peywireke pîr mezin dikeve ser we. Daxwa-za min ji we heye ku, hûn olê bi rastî bi gel bidin zanîn, bi-din fîmkirin, lê ne bi çewtî û şasîti.

Ez dixwazim ji hediseyekê minakekê bidim. Hz. Muhe-med dibêje "Ên ku xaka wî di bin destê dagirkeran de be, ola (dînê) wî, namûsa wî û her tişte wî ji di bin destan de ye." Xwedê Teala ji gotiye, "Mirovî ku bi gelê xwe re xayîn be, jê hez nakim."

Ên ku ji bo xaka xwe bêne kuştin, ew şehîd in. Lê belê, iro em dinêrin meleyên ku i-ro şehîdan dişon, hizbulah ji wan re dibêje, nimêja me li

dû we nabe, ji ber ku hûn ge-riyân dişon. Hizbulah li ser navê misilmantiyê û oldariyê derketin. Lê ew, ji bo misil-mantiyê tu karînakin. Ji da-girkeran re bûne navgîn (alet) û alîkariya wan dikin. Hûn meleyen oldar ên pîşverû, karin wekakan ji Quranê û ji pirtûkan bînîn zîmîn. Hûn karin gotaran, pirtûkan binivîsin, kar û xebatan bikin.

Iro dûgela (dewleta) dagirker gelê xwe li hemberî têko-şîna gelê Kurd agahdar dike, bi awayekî berevaji. Li diji wan xwînmijan em ji, gelê xwe agahdar bikin, wan şîyar bikin û gav bi gav ber bi aza-diyyê ve bimeşin.

Ezê bi hevokek Seyîd Riza taliyê bînim. Berî ku şehîd bi keve gotiye: "Ez heftê û pênc salî me, ez diherim nav şe-hîdîn Kurdistanê, xortên Kurdan wê tola (heyfa) me hilîlin. Bi ji Kurd û Kurdistan"

Geli oldarêñ hêja! Ev wes-yeta hanê ji wek, wesjeta Şex Sejd û yên oldarêñ din; bar e û li ser milê hemû ke-san e. Hûn vê yekê tu carî ji bîr nekin; oldariya xwe ji bo serxwebûn û azadiya gel û welat û mirovahiyê pêk bînîn.

**Girtîgeha Aydinê
Mele Xelîl Kurt**

FERHENGOK

- Binhişin:** (Bilinçaltı)
- Çal:** Kortik (Çukur)
- Dadmendi:** Edalet
- Dan:** (Öğün)
- Dêhat:** Pêşeroj, wê bê (gelecek)
- Doz:** Dawe
- Dozger:** (Savcı)
- Endaze:** Bi ihtiyat
- Har:** Kesê ji rê çûyî (Kuduz, çok kızgın)
- Harbûyi:** (Kudurmuş, çok kızmış)
- Henas:** Hilm (Soluk)
- Heyirin:** Şaşbûn
- Hilşandin:** Hilweşandin
- Kal:** Pîr, ixtiyar
- Karsaz:** Patron
- Mîr:** Prens, emîr
- Navser:** (Doruk)
- Nifş:** Nesîl (Kuşak)
- Noq:** Navteng (Bel)
- Pak:** Baş, rind
- Peçinandin:** Veşartin
- Serdem:** Dewr, çax
- Serdozger:** (Başsavcı)
- Serhişin:** (Bilinçlü)
- Serokatî:** Pêşengî (Önderlik)
- Seyd:** Nêçîr
- Texbî:** Plastik
- Vejîn:** Zindibûn (Dirilmek)
- Vîn:** İrade
- Wexer:** Sefer, gerr
- Xweber:** Xweser (Özgün)
- Zanîngeh:** Üniversite
- Zarav:** Lehçe, dialekt

'Gelî Kurdê Ezîdî xwe bikin yek!'

Herweki dihê (tê) zanîn, we-latê me Kurdan wêrankirî ye, talankirî ye, kevir û darêñ me gul û çîçekîn me, sar û çîlmisi mane. Eger em li şex-siyeta însanîn xwe yên Kurd bihişînîn, gelekî xirab, paş-mayî û xwewindakirî ne. Di serî de ziman, kultur, tore, urf û adet di dîrokê de dijmi-nan weke şexsiyeta Kurd tu-ne kiriye, lê belê dîsa Kurdan kultur û zimanê xwe parasti-ye û li ber xwe daye, di goti-na yekemîn de karin bibêjin Kurdê Ezîdî gelê Kurd û mi-rovatiya wê li ser piya hiştiye em bihişînîn hîn Ezîdî adetê me yên neteweyî li xwe di-kin. Lê Ezîdî, sebeba ku hati-ne perçiqandin ji hêla dijmi-nan ve gelekî tîrsiyane, gelek lîsk li ser wan çêbûne. Axa li ser wan çêkirine, bi wan lîstîne, fitne, fesadî di nava wan de gelekî hatiye meşandin. Sala 1985 dijmin pasepor-tan dida kesê Kurd û bi tay-beti Ezîdiyan û wan dişand Ewrûpa, riya nexweşiyê, riya nemirovatiyê. Lê ya rastî riya

mirin û windabûna Kurda: Li we-lat dijmin bi zilm û lêdanê, mirovîn Kurd dikuştin, yan ji seqet dihiştin, lê li vir, yanî li Ewrûpa, Almanya lîstikêñ dij-minan dîsa hene, em karin bibêjin wêraniya mezin ev e, heval ji heval xeyîdi, bira naxwaze qencîya bira, kesen xwe windakirî, di qumarxan-an de hetanî sibehê nayêne mal, li qehwexanan, li ser kaxezan serxweş, tişte malê xwe perê xwe diçê berdide, himbarê sûka, bi şevan di qehwan de nayêne mal, za-rok, pîrek digirîn, giriyê kafîran bi halê wan tê. Lê li ali-yekî din kesen welatparêz ji, riya însanetiyê dimeşînîn. Li vê derê (Almanya) ên ku ge-lekî lîstik, fitne, fesadî li ser wan tê çêkirin Kurden Ezîdî ne. Axayên xayîn ên wek kesen Şêxmûsê Çelebi û yên din li we-lat ew bi hev û din didan kuştin, karîbûn ji bo tiştekî pîs canê xwe bidin. Hin kesen Ezîdî li vir hene, xwe ji gelê xwe dûr dixin û pereyan dişînîn ji van axayan

re, ji van xayînan re, ji van bêbextan re. "Geli Kurdê Ezîdî xwe bikin yekî" hîn ji we li ber çavan dikujin we dît axayên xayîn li riya Midyatê derketin pêşîya birêñ we û di mînibusê de kuştin, we dît ji Dênwânan du birayên hev, bi navê Felît û Üsif bi destê van bêbextan hatin kuştin. Ma qey hûnê bibêjin na? Ji bo van tiştan em dibêjin, xwe bikin welatparêz, ev qas tiştên me nîvîsandin hemû rast in, nayêñ înkarkirin, dev ji van tiştan berdin, rastiyê bigirin. Xwe nexapînîn, hûn mîr in, hûn leheng in, we gelek qer-geşûn derbas kirine, we şehîd dane, li dora ERNK'ê xwe kom bikin. Bêrivan, Alî, Şêxmûs, Aîican ji bîr mekin, birîna we kûr e. Nebêjin, "Ê han misilman e, yan ê dinê", şeref, namûs di bin lingan de ye, xwe bişidînîn ey 'Qehremânîn gelê Ezîdiyan'.

Bi silavên şoresgerî.

**Xortek Başûr
Herford-Almanya**

Welatê xwe bi tenê bernedin

Îsal di meha Sibatê de zila-mek ji Wêranşarê dixwest pî-reka xwe û zarokên xwe bişî-ne Almanya û ji pîreka xwe re dibêje: "Ku tu çûyi Almanya, bikeve nav Almanan, de-ma bixwazin te şûn de bişînin bîbêje "Ez dixwazim iltîca bi-kim", hingê nikarin te bişûn ve bişînin. Bi vî awayî bin jin û zarokên xwe ve ji ku herin Almanya, dikevin rî, diçin Stenbolê ku li balefirê siwar bibin. Polis tê pêşîya wan û nahêle derbas bibin, hingê gotinê mîrê wê têr bîra wê û dibêje, "Ez dixwazim iltîca bi-kim".

Li ser vê yekê polis wan bi zorê derdixin derve. Diherin

Gerek e em dayîka xwe bernedin û nerevin welatê xe-rîbiyê. Dayîka me bi hezar salan bindest maye, birîndar û bêkes maye. Tu welat û tu kes nebûye derman ji gelê me û welatê me re. Em gerek li halê hev bipirsin. Tu kes nayê li halê me napirse, ji xeynî Partiya Karkerê Kurdistanê.

Newroza we pîroz be

Xebatkarêñ Welat ez gelek silavên şoresgerî bi rî dikim. Gelê Kurd pîroz dikim. Xisû-si ji we re gelekî spasdîr im, ku hûn bi Welat riya me ya azadî û serxwebûnê ronahî dikin.

Ez xwendevanekî we yê li Antalyayê me. Ez her dem Welat dixwînim û ez gelekî

**Salih Demîr
Antalya**

Qumandariya Eyaleta Amedê:

'Serokatiya PKK'ê îradeya me gişan e'

KURD-HA Berdevkê çapemeniyê yê Qumandariya Eyaleta Amedê li ser biryara şerrawestandinê û rewşa dwî daxuyaniyek da Ajansa Kurd-Ha.

Daxuyanî li ser şasbûna dewleta Tirk û tewra wî ya li hember şerrawestandinâ ji a-liyê PKK'ê ve, hatiye ilankirin disechine û wiha didome: "Dewleta Tirk nizane wê çî bersiv bide vê şerrawestandinê, şas bûye. Ji bo vê şasbûna xwe bipeçinîne (bi-veşere) beyanatên derew dide û nebûyian belav dike."

"Heta roja Newrozê, bi beyanat û pirsên wek "Emê bînîn ka gelê Kurd û hin hêzên PKK'ê wê li gor biryara şerrawestandinê hereket bikin an na?" Rayedarén dewleta Tirk dixwestin rojêv berrevajî û şilo bikin.

"Lê dema Newrozê û piştî Newrozê, dinya giş bi çavêن xwe dîtin ku gelê Kurdistanê ji gotina serokatiya PKK'ê derakeve û santim bi santim li gor talîmatâ serokatiya me dimeše."

"Dîsa dinya giş bû şahid ku, arteşa (ordi) Tirk û hêzên polî-



Gerilayê ARGK'ê: "Lê dema Newrozê û piştî Newrozê, dinya giş bi çavêن xwe dîtin ku gelê Kurdistanê ji gotina serokatiya PKK'ê derakeve û santim bi santim li gor talîmatâ serokatiya me dimeše."

san bi temamî ne di bin kontrol û otorîteya hikûmeta Komara Tirk û Serokwezirê wê Demirel de ne.

"Lê, tevî vê yekê dewleta Tirk a faşist, ku hêviya xwe bi derewan ve girêdaye, dev ji spekulasyonan (nûçeyen bêbînî) bernade.

"Bi taybetî der heqê Eyaleta Amedê de, nebûyian diafirîne, idia dike ku. Eyaleta Amedê li gor talîmatân Serokatiya PKK'ê nameše. Ev nûçe giş yekcar derew û bêbînî ne.

"Sistema me ya emir û komutayê, bi temamî dişixule. Tu pirsgirêkî me di vê mi-jarê de tunin. Serokatiya Partiya me vîna (îradeya) me gişan e. Ne tenê îradeya partîzan, ya gelê Kurdistanê giş di şexsiyeta Serok Apo de ci-viyyate.

Em feyde dibînin careke din bibêjin ku, dewleta Tirk bi van kîrinê acîzane û qels na-gîhîje meqseدا xwe û ya baş ew e ku, bersiveke rast bide vê gavê dirokî ku partiya me avetiye."

Şeva piştgiriyyê li Erzeromê

Navenda Nûçeyan- Şeva 28'ê Adarê li Erzeromê di sî-nemaya Zaferê de ji aliyê Komela Mafêni Mirovan a Erzurumê ve hate pîrozkarin. Ev şeva ku bi navê piştgiri û dostaniyê hate lidarxistin, bi besdariya hezar kesî bi coş û şahî, bi stran û dilan xemili.

Sev bi rawestandinâ rîzdarîyê ji bo bîranîna şehîdan, Sêrokê KMM'ya Erzeromê **Melih Aygün** li ser wateya (maneya) şevê û mafêni mirovan axîv û wiha got: "Em di demeke ku bi pîr pîrsigirêkî mafêni mirovan hene de derbas dibin. Di van demen dawî de, pirsgirêkî mafêni mirovan û ihlalkirina mafêni mirovan ji her demê zedetir bûne, ev jî me gişan xemgîn dike." Li ser pîrsa Kurdi jî Melih Aygün wiha peyi: "Dîrok şahid e. Zorê her dem li hemberi zoreke din yanê dij-zor afirandiye. Bi zor û terorê, bi kuştin mirovan kesî hetairo tu pîrs û pirsgirêkî careser nekirine.

Ji dewleta Federal a Kurdistanê dawetî

Ji Dewleta Federal a Kurdistanê (Kurdistan Başûr) Serokê Frakşona Kesik (PUK) Kemal Fuad li ser navê rojnameya me, Berpirsyarê Giştî Abdullah Keskin û hin rojnamevanen din dawetî Dewleta Federal a Kurdistanê kir. Ev dawet bi sedema hevdîtin û naskirin, rewşa Dewleta Federal a abori, siyasi û idarî di cih de bê tesbit û agahdarkirin, pêk tê. Tê xwestin ku, dawet di navbera mîjuya 7 û 15'ê Nisana 1993'an de pêk were.

Rojnamevanen din yênu ku hatine dawetkirin ev in: Xwediye rojnameya Özgür Gündem Yaşar Kaya, nîvîskarê rojnameya Özgür Gündem Haluk Gerger, nûçegihanê BBC Ragip Duran, Cigirê Serokê Enstituya Kurdi Abdurrahman Durre û Berpirsiyarê rojnameya Yeni Ülke Ferda Çetin.

HAWAR

Dilbixwîn

Rojê cejnê dirêj in, derbas nabin

Bila her kes bixwîne. Ez devê nameya xwe nagirim. Bi derengî be ji, hêvidar im, tu li dilê xwe negirî û ji dost û hogiran re bixwîni.

Ev ne rojê hatinê ne, ne rojê xemilandin, dilan û şahiye ne. Ev ne rojê ku em bi desten hev bigirin û derkevine seyranê, ev ne rojê ku tê de stranê romantikî ji hev re bixwînin û dilan bidin kîleka hev û bi pîlîn evînê germ bikin. Bawer bike ez nikarim ji hatina te re bibêjim: "Tu bi xêr hatî!" Giran e, lê hema gotin nikare veşartî di dilê min de bimîne.

Em zarok bûn. Me A, B'ya jiyanê nas nekiribû. Me nizanibû cîma roj hiltê û cîma diçê ava. Me nizanibû cîma jiyan, mirinê bi xwe re tîne... Belê, em di vê gerdûnê de kerr, kor û lal bûn. Ji lew re dema ku tu dihatî, devê me li ken bû, dilê me geş bû... Em li benda hatina te heya serê beyanê diman. Mîna kevokên'aza, em serbest difirîyan, dinya tev a me bû.

Lê hema niha; tu tîyî, diçî em qet bi te nahesin. Dema ku em bi te dihesin ji, bawer bike rojê in, derbas nabin. Weke berê bi me ne şîrîn in, eger tu rast dixwazî hatina te, ne bi dilê me ye. Ez dizanim ev gotin wê li zora te were, lê hema ezê ci bikim, pêla evîna welat û dîndara Kurdistanê bedew, zora xwe daye ser pînûsa min, ez naxwazîm rî li pêsiyê bigirim û azadiyê lê qedexe bikim.

Cejna xemgîn, Tu bi Kurdi diza-nî bixwîni? Te heya niha tu rojê xwe bi Kurdi derbas kîrine? Te bi Kurdi heya niha ji me re gotiye: "Cejna we pîroz be?" Bawer na-kim, lê hema hêvidar im tu xwe hînî Kurdi bîkî ji bo ku baş ji nameya min fêm bîkî û bizanibû derde di dilê min de bixwîni. Derd û kul nayen wergerandin.

Li Newroza Berlinê min, di gel mamosta A. Durre, Dr. Cemal Nebez dît. Min jê pîrsi: "Cîma nav li te dikim nasyonalist?" Keserek kîşand û got: Bibêje kî nav li te dike nasyonalist? Ezê pîrsa te bi kurtî bîbersivînim. Di bin navê komunîzmê de weke tu dizanî gelek kesa dev ji Kurdistanê berdan û bûne "Internasyonalist", kesê ku bigota ez Kurd im, di-gotin ev nasyonalist e. Welatparêziye nasyonalizm diditîn. Ji ber ku min berî her tiştî ji xwe re Kurdistan welat û xelasî ditibû, nav li min jî kirin nasyonalist..."

Tu kesi welatê me neparast. Ne komunîstan û ne jî im-peryalîstan. Ne Rojhîlat û ne jî Rojava. Em bi gelek navan xapandin, em ji xwe re kîrin her tişt, tu rûmet û cih nedane me, tim çavên me li jîr bûn, histûyê me xwar bû... Dema ku me welatê xwe diparast ji, em teşîhir dikirin û digotin ev kes şovenist in, nîjaderest in... Ji lew re parastina welat me şovenizm didit, em mecbûr bûn bibêjin: "Biji Filistîn!" Ji ber ku di wê sloganê de mirovahî û internasyonalizm hebû... Biborîn, me tu caran di rojê te de, xwe şad nedîtiye. Lewma hâtina te bi me giran tê.

Abdullah Pêşew di helbesteke xwe de dibêje: "Eger delegasyonek biçe Kurdistanê, ji min bipirse; "Serbazê we yê bînav li ku derê ye, da ku ez gurzek gul deynim ser?" Ezê bibêjim: "Hema ku tu derbasî Kurdistanê bûyi, gavê xwe bavê û gula xwe deyne. Tu dereke ku xwîn lê nehatibe rijandin tune ye. Kurdistan bost bi bost cihê serbazê bînav e..."

De tu ji xwe re binirxîne, emê çawa bikaribin bi te re bikenin û bixêrhatina te bikin? Emê çawa bikaribin bersiva da-yîken ku keç û lawêwan ji wan dûr in, bidin? Emê çawa nameya zarokên şehîdan di van rojan de şad bikin? Gelo, tu ji bo me, lê ji bo kesnê din têyi?

Em ne bê hêvi ne, careke din emê guleke sor hilgirin û li ser rûyê Kurdistanâ serbixwe, destê xwe bidin destê te û strana "Ey Newroz, tu li gelê Arî pîroz" bistêrin...

HEYVA SOR a Kurdistanê damezirî

Nûçeyên Derve-

Sazgeha yekemîn a Kurdan a alîkariyê. li bajarê Bochumê li Almanyayê bi navê HEYVA SOR (Kizilay) di 15'ê Adarê de damezirî. Ev sazgeh bi sedema alîkariya hemû Kurd û Kurdistanîyê şerpeze hatiye damezirandin. HEYVA SOR di vê navê de bi hemû sazgehê

alîkariyê yê Ewrûpa re, bi saziyên astî û Xaçasor re dikeve têkiliyê.

HEYVA SOR bi saziya girtiyan HEVKOMÊ re ji di têkiliyê de ye. Niha li Finlandiya û Hollanda dest bi kampanyayê alîkariyê ji bo zarokên Kurd kiriye.

Di nav çarçoveya qanûnên Almanya de wezîfeyê HEYVA SOR

wiha tên rîzkirin.

1. Heta ji destê wan bê, alîkariyê bi kesên ku di şerê li Kurdistanê de zirar dîtine de bikin.

2. Alikariya bi kesên ku nexweş, perişan, seqet û desttengiyê de ne bê kirin.

3. Alîkariya înşakirina malên kesên ku di şer de xera bûne.

4. Alikariya bi zarokên

ku malbatê wan di şer de mirine. Di vî warî de ji bo bi warkirina wan û xwendina wan wê alîkarî bi wan re bê kirin.

5. Ji bo kesên ku di şer de birîndar bûne û kesên ku işkence dîtine, çareserkirina problemen wan ên sihetê.

6. Alîkariya bi kesên ku ji ber xebatê xwe yê

politîk ve hatine girtin.

7. Bi sazgehê bi vî rengî ku li ser navê gelên din hatine damezirandin re, bi pêşxistina têkiliyê dostanî û piştgiriyê.

Navnîşana HEYVA SOR ev e:

HEYVA SOR
Van Gall Str. 2 4630
Bochum 1/Germany
Tel-Fax: 234. 541245

çareserkirina pirsa Kurdi re amade ye.

PKK'ê bi vî gavî ne tenê hêza xwe nîşan da, wekî din îspat kir ku rojev ji, ji alyî wê ve tê kifşikirin."

Piştî van gotinan Karasu li ser wêbêya têkoşînê ji hinêk peyivî û di nava çepik û tezahurata guhdaran de gotinê xwe temam kiran.

Bi stranê Koma Berxwedan de gel bi dilgermî û bi kîf dest bi govendê kir û bi strana "Apo hate Hilwanê" şev qediyâ.

İsrail êrîş bire ser kampê Filîstînî

Hêzên İsrail kampa gerîlayen Filistîn Nahr-El Barcd ya li Lubnana Başûr bombebaran kir. Di êrişan de sê Filistînî ji, bi roketan bersiv dan van êrişan.

Artêşa İsrailê roja yekê Nisanê dîsa êrîsi ser kampê gerîlayen Filistînî kir. li gor tesbîten pêşin 3 gerila birîndar bûn. Kampê Filistîniyan li Lubnana Başûr hâtine bicikirin.

Li gor Ajansa Anadoluyê, di 2'ye Nisanê de hêzên İsrail êrîş birin ser kampê gerîlayen penaber ên Filistînî û sê gerila di êrişen pêsi de birîndar bûn.

Gerîlayen Rêxistina Qumandariya Gistî ku girêdayê Eniya Rizgariya Gelê Filistînî di bin Qumandariya Ahmet Cibril de li hember êrişen hêzên İsrail li ber xwe dan û bi roketan bersiva wan dan.

Hêzên İsrail ji keştiyên cengê balefir û helîkopteran radikin û digirin ser kampê Filistîniyan. Gerîlayen Filistînî ji, ji bo rê li ber êrişen artêşa İsrail bigirin. li ber keviya behrê mewziyên xwe cedîkin.

Şeva Newrozê li Kolnê

Nûçeyên Derve-

Di 27'ê Adarê de li bajarê Almanyayê Kolnê. Newroz ji alyî 12 hezar kesî ve hate pîrozkirin. Di vê şeva ku hemû kesî kincê neteweyî li xwe kiribûn, bi listikên tiyatro û stranê komên müzikê şahiya Newrozê bi rengekî coş û geş derbas bû.

Di nava van Kurdênu ku ji

welatê xwe dûrkêtî de Mustafa Karasu, ku berî demekê ji zîndanê derketibû, li ser Newrozê û rewşa Kurdistanê axaftinek kîr. Karasu bi kurtî wiha peyivî: "Ev hefte ya lehengiya neteweyî ye... Mewziyên me yêni bi destxistî hene. Ev bi deh salan e me fedekariyên mezin kirine. Vê rewşê, Newroz bi serê xwe kiriye

roja azadiya gel. Iro partî û eniya me gihiştiye merhaleya ji dijmin hesappirskirinê û qonaxa serfiraziye. Di demeke wisa de, maneyâ rawestandinâ şer ji alyê partiya me ve, pirr mezin e.

Serrawestandin ne termeke ku dikaribe ji alyê her kesî ve bê bikaranîn. Di dema ku şer di navbera

du aliyan de şax dide û hêzên herdu aliyan di dengeyekê de ne, serrawestandin manewrayeke ji bo di niqteyeke din de çare ji vî şerî re bê dîtin. Banga şerrawestandinê bi xwe re maneya hêza PKK'ê ji derdixe holê.

Bi vî gavî, PKK'ê da xuyakirin ku, ne tenê di cengede, di warêni siyasi de ji, ji

GOTIN



Yaşar Kaya

Şoreşa Kurdistanê

Dîroka Kurdistanê, dîroka serhildan û dîroka îxanetê ye. Sed sed û pêncî sal e li Kurdistanê serhildan kêm nebûne. Ev pêncî salên paşîn dewra ronahîbûna qafê Kurdan e. Heq e em ji vê ronahîyê re bibêjin "ronahîya mezin." Piştî wê ronîya mezin, serhildana çekdarî dest pê kir. Ji 1984'an heya niha, nêzîkî deh salan dom kir û hê ji dom dike. Serokatiya Partiya Karkerê Kurdistanê, doza Kurdan û Kurdistanê li dinê, anî danî ber çavê Koma Miletan. İro dinya dizane ku, doza Kurdan doza yekane ye. Berî gişan ew di rê de neçe, çenabe.

Piştî şerê çekdarî, ji iro pê ve doza Kurdistanê bi astî, bi xweşî, bi siyasetê, bi diplomasiyê wê bi pêş ve here. Çare tune, ev qewmîneke bi qazanc e. Qazanceke geleki mezin e. Lî belê divê şoreşvan, partî û rêxistên Kurdistanê ji bo azadî û sefiraziya Kurdistanê bixebeitin. Divê ev bêne cem hev, ji xwe re cepheyekê çêbikin. Komcivîna wan şert e, yekbûna wan şert e. Bi gotina mamos-teyê delal İsmail Beşîkî em bibêjin; "Berî her tiştî biratiya Kurdan ji Kurdan re lazim e.". Kurd bi Kurdan re nebin bira, xêra wan ji tu kesî re tune.

İro şoreşa Kurdistanê cihek serfiraz û bilind. Di dînyayê de welatê kesî mîna welatê Kurdan nebûye çar parce. Her parek di destê neyarekî de ye. Gava yekbûna Kurdan tê rojevê, ev neyar berî Kurdan têne cem hev û dibine yek. Ew ji me zûtir xêr û bêra xwe dizanîn, komî cem hev dibin û şixulê xwe diqedînîn. Divê em Kurd her tim vê rewşê bidine ber çavê xwe.

İro heval û hogir, dost û neyar dizanîn ku, li Kurdistanîraqe dewlete-

Şoreşa Kurdistanê, bi Meclîsa Neteweyî re wê tacâ zêrin bide serê xwe. Meclîs dengê Kurdan û Kurdistanê ye, dengê biratiyê ye. Bi meclîsê gelek şixul wê biqedin, şoreşa çekdarî, aboriya welêt û Kurdan, diplomasî û siyaseta Kurdistanê êdî bi destê meclîsê wê biçe. Èdî kes nikare bibêje Kurd "terorîst" in. Kurd bi çek in, partî Kurdan idare dike.

ke Kurdan heye. Lî belê, bê mecal e, dewlemend nîn e. Xwarin tune, derman tune, zarok dimirin, gelek Kurd per perişan in. Ev reza wiha naçê. Ew bi vî taqetî nikarin tiştîkî bikin û wê nifta[petrola] xwe jî bifiroşin. Li alyî dinê Partiya Karkerê Kurdistanê nêzîkayî wan dibe. Meclîsa Netewe-

yiya Kurdistanê wê li hev bicivînin. Şert e ku ev civîn, li cihek azad û serfiraz be. Civîn û biratiya Mam Celal û Abdullah Öcalan, pêşıya gellek şuxulan vekir. Ez wisa bawer dikim ku, yek jê cihê meclîsê ye.

Ji iro pêş ve, di nava welêt, li gellek deveran de, di nava ecnebiyan de deriyê diplomasîyê û siyasetê vekirin. Ev gavekî mezin e. Serokê Partiya Karkerê Kurdistanê Abdullah Öcalan, gazî serokê partiyê Kurdan ên din ji kir. Ger Kurd giliyên xwe bîkine yek wê gelek tiştî bê zehmet çêbîbin. Ev ji anegorî me gavekî bi xêr e, ev ji rast e.

Şoreşa Kurdistanê, bi Meclîsa Neteweyî re wê tacâ zêrin bide serê xwe. Meclîs dengê Kurdan û Kurdistanê ye, dengê biratiyê ye. Bi meclîsê gelek şixul wê biqedin, şoreşa çekdarî, aboriya welêt û Kurdan, diplomasî û siyaseta Kurdistanê êdî bi destê meclîsê wê biçe. Èdî kes nikare bibêje Kurd "terorîst" in. Kurd bi çek in, partî Kurdan idare dike.

Lî belê kîmasî û bi kurtî em dikarin bibêjin; şoreşa Kurdistanê du sê gavêni mezin avêtin, rûyê şoreşê guhertin. Ji iro pê ve dengê şoreşê, dengê meclîsa Kurdistanê ye, dengê welêt e, dengê Kurdan e. Çiqas partî û Kurdan bê partî hene, dikarin bêne vê derê. Dengê Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê, dengê gelê me ye, dengê hemû Kurdan e. Gelê ku li Kurdistanê rûdinê dengê wan e ji. Meclîsa Neteweyî, avahî û şenâhiya Kurdan û Kurdistanê ye.

Qatilê du xortên Kurd serbest digere

Li Stenbolê navçeya Avcilar komserkî qatilê du mirovan serbest digere. Komser İlyas Kaya, ku du Kurdên masûm bi demançeya xwe ya resmî kuştin, ji aliyê mehkemeyên Tirk ve bêsûc hate dîtin û beraet bû.

Navenda Nûçeyan-

Komserê Emniyetê **İlyas Kaya** ku sala çûyi li Avcilar du xortên Kurd ên destvala kuştin û dû re saleke wî neqediya ji aliyê Daîra Cezaya Yargitayê ve hate beraetkirin.

Sala çûyi. di restoran-tekê de, du xortên Kurd. **Ali Haydar Alpdoğan** û **Kemal Karatay** ku propagandaya Partiya Karikerên Kurdistan bi devkî kribûn. ji aliyê Komser İlyas Kaya bi demançeyê hatibû

qetilkirin. Li ser vê yekê Komser İlyas Kaya hatibû girtin, lê hîna di ser girtiina wî re salek derbas nebû, ji aliyê mehkemeya Tirk ve bêsûc û mudafakarê Komara Tirk hate qebûl kîrin û beraet bû.

Beraeta qatilê du mirovên destvala, di çapemeniya Tirk de nehate nivîsandin. Tenê di rojnameya Meydanê de beraeta wî wek nûçeyeke kurt derket. Meydan, Komser mafdar nîşan dide û çawa ku herdu

xortan mirin heq kiribin, bûyerê dinirxîne.

Beraeta Komserê ku qatilê du mirovan e, bêedaletiya mehkemeyên dewleta Tirk nîşan dide. Li aliyekî bi hezaran kes ji bo dîtin û nivîsen xwe yên siyasi, bi deh salan di zîndanan de radizên, tade û işkenceyên herî dijwar dibînin, li aliyê din qatilê tesbîtkiri têr beraetkirin û di nav civakê de bi serbestî digerin.

Çapemeniya Tirk ku carna dizê hêk an jî nanekî derdixe manşetê, bi bûye-reke wek a komser re, jix-we eleqedar nabe û bi bêdengiyê, bêedaletiya mehkemeyên Tirk ve-disêre.



Qatilê du xortên Kurd İlyas Kaya, beraet kir.

Teklîfa ajantiyê

Roja 19'ê Adarê li bajarê Kirşehîrê, endamê Partiya Keda Gel (HEP) a Kirşehîr **Dağıstan Baran**, ji teref polisên sivil ve hate binçavkirin.

Dema Dağıstan Baran dixin binçav, dixwazin bi zorê der heqê berpirsiyarê (HEP) ê de ifadeyên derewin û nerast pê bidin qebûlkirin û tekliifa ajantiyê lê dikin. Dağıstan Baran tiştên ku polis dibêjin qebûl nake. Pişte re polis dest bi heqaret û tehdîdan li berpirsiyarê "HEP" ê dikin. Ü randewî didin Dağıstan Baran, pişti hevdîtinê, polis dest datînin ser nasnameya Dağıstan Baran û wî berdidin.

Partiya Keda Gel, ji bo Dağıstan Baran, roja 20'ê Adarê Midûriya Emniyeta Kirşehîr dide mehkemeya Cumhuriyetê û nasnameyê Dağıstan Baran car din ji emniyetê distînîn.

Li ser vê bûyerê "HEP" ê daxuyaniyek belav kir. Di daxuyaniyê de wiha tê gotin: "Ev tewra muduriya emniyetê wek êrisen li hemberî endamên me, partiya me û demokrasiyê dipejîrinin, em vê tewra Emniyetê li ber raya giştî protesto dikin û ji niha pê ve ji Partiya Keda Gel, ci bê serê endamê me, mesûlê wan, midûriyeta emniyetê ye.

Li Buca û Amasya grep dom dikin

Li zîndanên Tirkîyê û Kurdistanê pirs-girêken zindanan, zilm û zora li ser girtiyan, bi tu awayî xelas nabin. Li zîndanevê grep diqedede, li du zîndanên din grep dest pê dike. Ev reşwa hanê ne tenê girtiyan, malbatêwan jî pirr diêşîne.

Navenda Nûçeyan- Li zîndanên Tirkîyê û Kurdistanê pirs-girêken zindanan, zilm û zora li ser girtiyan, bi tu awayî xelas nabin. Li zîndanevê grep diqedede, li du zîndanên din grep dest pê dike. Ev reşwa hanê ne tenê girtiyan, malbatêwan jî pirr diêşîne.

Dikare bê gotin ku sal dozdeh meh, grepê birçibûnê li zîndanên dewleta Tirkîyê berdewam in. Carna li girtîgehekê, carna jî li gişan bi hev re û protesto li hemberî zilm û zorê çedîbin.

Di meha Adarê de jî grep û protestoyê girtiyan siyasi berdewam bûn.

Li girtîgehê Çanakkale, Yozgat, Buca û Amasya yê zêdeyî 100 girtiyan siyasi bi mebesta protestakirina şert û pesten idareyê ketin greva birçibûnê.


Di dawiya meha Adarê de, li Yozgat û Çanakkale grep qedîyan, li Buca û Amasya hîn dom dike.

30 girtiyan zîndana Çanakkale ku, di destpêka meha Adarê de dest bi gre-

va birçibûnê kiribûn, di roja 28'an de, pişti ku bi rayedaren SHP'ê, baroyê û idareya zîndanê re rûniştin, livbaziya xwe qedandin.

Li Zîndana Yozgatê jî, girtiyan di grepê de roja 29'ê Adarê daxwazên xwe bi dest xistibûn û dev ji grepê berdabûn.

Li aliyê din, 65 girtiyan Zîndana Bucayê û li 16 girtiyan a Amasyayê hîna di grepê de ne û rewşa siheta wan, ber bi xerabiyê ve diçe.



GÜLEN MEZRABOTAN
ZAROKÊN AGIRI
LEZKIN

NAVNIŞANEN XWESTINÊ
NÇM (MKM) NAVEND
Tarlabasi Cad. No: 128
Taksim / İst. Tlf: 254 48 65
ÜLKEM KİTABEVİ
859. sok No: 4/D Konak/
İzmir Tlf: 84 49 12
NÇM (MKM) DIYARBEKİR
Akkoynlu 4. sok Deniz Apt.
29 17

**Qaseta
Gulên
Mezrabetan
Zarokên Agirî
ya bi navê
'Lezkin'
DERKET**

No:1 Ofis/ Diyarbekir Telf:
23 23 84
Ses Plak ve Kaset
İMÇ 6.Blok No: 6410
Unkapanı/İst Tlf: 527 52 61
Melsa
Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No: 5 Kat: 3/8 Tlf: 512
29 17

Weşanxaneya Melsa bi çalakiyên nû dixwaze xizmeta xwendevanê xwe bike

Xwendevan û kesên eleqedar dikarin hemû pirtükên bi Kurdî, pirtükên zanistî û yên ku li ser Kurdan hatine nivîsin, qaseten bi Kurdî û her celeb kovar, qert û afîşan ji Weşanxaneya Melsayê bi dest bixînîn.

NAVNIŞANA XWESTINÊ:
Nuruosmaniye Cad.
Atay Apt. No: 5, Kat 3/8
Tlf: 512 29 17

Derheqê exlaqî di çend qisey

J. Espan

Tayn mefhum û termî esti ki ma hergû roj gurênenî. Bê guman hergî mefhumâ ki ma gurênenî, yew ci ifade kena û wayirê yew fonksiyonî ya. Me'nay tayn mefhuman û terman zeman reyra vuriyêna (bedelêna). No prosesî vuriyayî (bedeliyayî), ge bi gore bê lazimey û qaidandê cemati beno. Gilangan zi, héz û mekanizmaya serdestî mûdaxeley nê prosesi keni û bi gorê bê menfetandê xwe me'nay mefhuman vurênenî. Exlaq nê mefhuman re yew o. Herkes bi gore bê xwi térif keno, yan zi bi gore bê xwi me'nâ dano bide.

EXLAQ CI YO MA TI RA CI FAHM KENI?

Ma caxo ku kuce di rastê yew sînasi ya zi dostê xwi yenî, ma destê yê gêni, ya zi ma silam danî bide. Halbiko eke ma silam nêdi, yew ma nêtepseño û nêdekeno hepis. La belê ma mecbûr silam bido, çunki no edet o, cemati bê nê têkiliyanê sosyalan nêbeno û hergû cemati wayirê tayn norm û qaidan o. Herkes zi gore bê xwi yew qiyet dano nê qaidan. Nê normê exlaqî yi. Na ray cemati ma di, menay exlaqî zafteng o. Wexto ki qalê exlaqî beno, zefîney têkili cematiyan û camerdan yenî ma virî. Hetta ekeki raştî vaji tekiliyî yîni ki silabendî ra cér yenî kê virî. Mesela wexto ki ma vanî "filankes bê exlaq o" ma wazeni vaji, ay mîrdim guranê pîsan keno yan zi, şino cayandê xiraban. Caxo ki ma vanî "tiya di exlaq nîmendo", qestê ma a yo ki, ay ca di gurey xirabî vêsi biyi. Helbet elaqay nê qisan û exlaqî tê reyra esta. La belê, exlaq tenya têkili ceni û camerdan niyo. Aw semed ra lazim o ki, ma verê exlaqî térif biki. Exlaq ci yo?

Kê sêni vacî, yew cemati heme prensibane adet û toran rî exlax vaceno. Helbet kê sêni yewna hewa zi térif biki: Yew cemati di mîrdim, hem ver a yewbinan û hem zi ver a cemati mesuli. Yanî ver a yewbinan û ver a cemati tayn wezifey yîni esti. Hewna semedo ki mîrdim tê reyra ciwiyenî, aw semed ra tayn qaidanê musterekân peyda keni û nê qaidey cemati di cagêni û benî nênuştey. Kê sêni vacî, exlaq, yekûnê nê qaidan û têkiliyanê cematiyan o.

Ana aseno ki, hem silam dayisê ma û hem zi heme têkiliye me yê sosyal û sewbi ciyê ki cemati qiyet dano bide yew parçey exlaqî yi.

EXLAQ, DİN Ú FELSEFİRA HINA KEYENÊR O

Tarixê exlaqî keyen o. Mîrdimey verê ki din ú felsefi bisinasno, exlaq sinasawno. Kes sêno vaco, tarixê exlaqî bi tarixdê cematan reyra dest pey kerdo. Xwi ra normal zi ganî ana bo. Cemati cendeyî primitif beno wa bibo, hewna zi ganî tayn normê exlaqî cemati di biki.

Hezey gelek meselan meseladex exlaqî ser o zi, teoriyê ciya ciya bî û ewro zi esti. Qorîni exlaq yew cido statik diyo û bawer kerdo ki cirray nevuriyêno (nêbedelyêno) Qorîni zi iddia kerdo ki, exlaq zi hezey gelek ciyanê cematiyan zeman reyra vu-

riyeno. Ewro hini ma rind zani prensib û normê exlaqî pabestey cemati yi. Cemati di hergû vuriyayiso radikal, normanenê zi vurênenî. Hergu têkiliya binkî ya ekonomikî û sosyal cemati di norm û prensibane newan peyda kena. Ma çend misalan bido.

Zeki yeno zanayîs mîrdimê verenî tê reyra bi yew hewawo kolektif ciwiyayî. Mulkiyeto ki bi heme kolektif bi. Nê weziyetê bi gore bê xwi tayn normê exlaqî zi peyda kerdi. Ay wext wayirê mal û mil biyayîs bê exlaqî hesebaynî û yewrezi û na bêexlaqey nêkerdinî.

Na gamî ra pey exlaqî kol'an û ey wayiranî yîni yewbinan ra aqetiya. Çunki menfet kolan û wayiranî yîni hini yew nêbi. Zulum kerdî, talanberdis, mîrdimkişîş û rotis bi exlaqî wayirê kolan. Wayirê kolan na gamî re pey waşt ki heme cemati nê normanî yîni qebul biko. Normê xwi kerdî exlaqî cemati.

Her çiqas peydakerdisé normanî exlaqî di, rolê ekonomi vêso zi, sewbi gelek ci exlaqî ser o tesir keni. Dîn nînan ra yew o. Gilangan rolê din, heme faktoranî binan ra vêşer biyo. Dîn ra teber tarix, kultur û sewbi faktör bîni zi exlaqî ser o tesir keni, ma vaji, ewro welatê Ewrûpa heme xiristianî, zaf yan zi tayn tesirî eyîni he-disanê cematiyan di mendî. La belê caxo ki, mesela yena normanî exlaqî ser, tayn meselan di wahire normanî ciyanan i.

Baş o, normê exlaqî esti, gore bê cematan û miletan vuriyêni. Ma nişni semedo ki zerrey ma wazena ma vacî, exlaqî fillan cemati rind o, ey ay bîni pîs o. Ya zi filan hereket hewl û bi exlaqî yo, filan hereket zi exlaqî ra teber o. Ganî tayn kriterî ma yê bînî biki.

Kê sêno vaco, hergû edet û to-rewo hewl, rind, bi edelet û mîrdimên cemati di, yew exlaqî pank peyda keno. Heme qâidey, bawerey û hereketî ki, cemati over benî, yew qedr û qiyet danî insani, zulum û t'eda werte re hewenerî û heq û hiqûq mîrdimî pawenî, exlaqî pankî temsil keni.

HEME HÊZÊ SERDEST Ú ZULUMKARI BÊ EXLAQÎ

Hêzê serdest û zulumkarî, yew heti ra ciwa dest di cematan terorize keni, heta bîni ra, êrisi heme ciyanê erjiyan keni. Cemati cendeyî dejenerê, bê exlaq û bê şexsiyet bîbî hukmî serdestan ehendeyî vêsi beno. Cora hêzê serdestî, wazeni bawerey, fikir û adetanê erjiyanan musterekân werte re hewenî û bi gore bê menfeatanê xwi normanî newan peyda biki.

No ware di kes şeno çend misalan bido: Welatê ki te de diktatoreya eskeran yan zi sewbi rejimê totaliter hukmî serî, heme heway rî bêexlaqey vêsi ya. Ma zaf durî nêşerî, he-ma Tirkiya İran û Suriye ra bewnî, nê welatan di cemati hetey normanî exlaqî ra yew krîz girdi miyan dirî. Nê rejimê totaliter, verê heme ci neyarê azadi û serbestey i. Nê rejimê neyarê fikranî newan û xaman i. Nê rejimî neyarê insanî bi şexsiyet i. Rejimanê anasaranî rî, mîrdimî koley lazim i. Çaxo ki, nê rejimî totoaliterî yew deme derg û dila hukim ser o monî, cemati hetey exlaqî ra kişenî. Ü bi gore bê xwi tayn normanî peyda keni. Cematanê anasaranî di, serdestan rî destbestî, sextekarey û zu-rîkerdis, heme çidî yîni rî sere

Ninan ra teber ay kategorîye cemati ki bîyi qirbanê nê bêexlaqey-dey yîni pêrû bê exlaqî yi. Mesela, yew veşeno ku yew letey nanî bilirawo bê exlaq o, yew mîrdimo ki bêhêvî birmano û bîbî alkolist bê exlaq o, yew ceniya ki leşey xwi biron-şo bê exlaq a. Helbet xwirotîş, bê exlaq a, semedo ki a yew neheqey pili bi xwi bi xwi kena. Mesela ewro fuhuşo ki Tirkiya di esto, hinzar ra yew Swêd di çinî yo. Tirkiya di yew mîyon ceniye bi wesiye esti çiri?

Cunki ki Swêd di, hergû des serî rayê, yew cuntaya eskerî nîna hukmî ser. Cunki yew koloniya Swêdi bi name bê Kurdistan çinî ya. Cunki Swêdi di, yew serî miyan di 500 teno sîvîl, kuçan di bi destê dewlatî nêkişenô û cemati bê veng temasey nê qetliamî nêkeno. Nika şima ku vajî qey problemê exlaqî Swêdi di çinî? Helbet esti, la belê wexto ki kî ey Tirkiya reyra muqayese bikî zaf taynî û problemê ciya yi.

Kirrey qali, cawo ki zulum û zordarey, neheqey û bê edeletey bîba, cawo ki demokrasi çinêba ay cadî problemê exlaqî vêsi yi. Hem zi şima çendeyî vacî ehendey. Yew welati di dewleti çendeyî zulumkar û bêbav bîba, deprasyono exlaqî zi ehendeyî xorî û xidar be-no.

KURDISTAN DI NORMÊ EXLAQÊ VURIYÊNÎ

Da vîst serî ra ver, normê exlaqî welatê me di ciya bî, ewro ciya yi. Ma verni di zi vatibi, hergû vuriyayiso sosyal û cematiyo bîbî, hewi ya zi xirab exlaqî ser o tesir keno.

Rojo ki Kurdistan di fîkrê xelerseydey Kurdistanî zergûn bî, tayn bo zi nê weziyeti, qorê insanî heti normê newey peyda kerdi. Eskara wo fîkrê azadkerdişê Kurdistanî, yew îdealo mîrdimên o. No îdealo mîrdimên o. No îdealo rîndey û hewley temsîl keno û wazeno cemati koleyey ra bixelesno û neheqeyâ hinzar serran werte ra heweno. Çaxo ki welatperwer û şoreşeranê Kurdistan bawerey xwi bi xelaseydey Kurdistanî ard, heme têkiliyî yîni zi vuriyay. Têkiliyanî yîni sosyal û cematiyan di, tolerans, mîrdiman ra hezkerdis, semedî yewnay xwi fedakerdis ca girewt. Nê kriten bî fel-sefey heyati yîni. Yîni bi gore bê nékrîteran ci ra va "hewl" ya zi "xirab". La belê nê normê exlaqî heta-nî ki leje azadi dest pê nêkerdiş sarî miyan di zaf vila nêbîbi.

1984 re pey caxo ki leji dest pey kerdi, lejo bîni zi beytarê normanî exlaqî verînan û keyenan dest pey kerdi. No leji hema ra zi romeno: Ü xelaseydey Kurdistanî ra pey yew demewo derg û dila do dewam bi-

ko. Ne normê newey ci yi?

Verê verikan Kurdistan di fîkrê welatperwery vila bî. Cemati di welatperwery bi yew normdo müşterek û herkesi qedr û qiyet da nê normê. Cemati xwi, newerna organîze kerd. Azadi û xwiserbiyayîse Kurdistanî ser o bi hinzar reyra mîrdim vecayı koyan ser û ver a zulum û neheqey dest bi herbi kerd. Cemati xwi miyan ra qehremani û canfiday veti û wayirey yîni ri kerd. Heme têkiliyî cemati cora bi cér vuryayî. Ciye ki mîrdiman verê qiyet dani bidê bî bî qiyet. Mesela, canî verê kevaniyey keydê xwi û may gedandê xwi bî. Cenîya ki camerdan heti bisaynî bîroşâ û di qalî bîka çinî bi ya zi zaf tayn bî. No weziyat bi gorê bê normanî verenâ zaf normal û edet bî. La-belê ewro, ceniya ti tifing bigêra û veca koyan ser û ver a dewleta kolonyalist lej bîka, ceniya tewr hewl a. Tenya ma mesela strukturê exlaqî cemati me di bincara vurêna.


Verê mîrdimî ki têkili yîni bi dewleti reyra bîbî, mîrdimî bi itibar bî. Ewro mîrdimî anasaranî Kurdan miyan di xayin hesebîni. Verê welatê ma di, itibar û qiyet mîrdimî bi gore bê pîtey ya zi feqîrî cemati ma di, bîyi qehremani. Verê cemati ma di hasidey, cimtengey bî, yew xeyrê ay bîni nêwaştinî. Ewro zafîney cemati guranî anasaranî eyb veyneno. Verê Kurdistan di çaxo ki yew bimerdinî yan zi bikîşaynî, key meyîti di rojón reyra hezin ronaynî. Rojan reydi mar û pîre yê dayn cokandê xwi ro. Ewro çaxo ki yew gerila sehid beno, cinazey yê bîna meydânî leji. Hetanî vêzêrî, roşanbirê Kurdan zi têde. Kurdan ziwan di xwi ra sermayaynî. Ewro ayê ki Kurdi nêzanî şermeyanî.

Kurdî cirray ehendey camerdey nêbiyi. Ma pîri zanî, gerila biyayî asan niyo. Hergû gami mergê gerilay ver a çiman o. Her çiqas ana wo zi, homaray gerillayan hergû serî hina vêsi bena. Hewna ma zanî kesê sîvîle ki, bi gerilay reydi têkiliyî yîni esti, dewleti gurey gu-reyênana ana yîni seri sardi. La belê hewna şari xwi tepe nêdano, ci gurewo bi yîni qedêno, keno.

Mîfhumâ toleransi verê ma Kurdan ri zaf xerib ameynî. Semedî yew kergî, Kurdan yewbinan kîstîni. Zaf dewi yew cengdê herri ser xirabe biyi. Lejî esîran serran reydi ro-mitîni. Ewro Kurdi hina vêsi dardê yewbinan ancenî û tehemûlê yewbinan keni.

Ewro, hîni mîlay sêxî û axay hezey verê nişni şari bixapenî. Sar hezey verê nezan niyo û şexan û melan dim a nêşano. Eskere wo ki, zanayîse şari çendeyî vêsi bo, exlaqî cemati zi ehendey pank beno.

Bi kilmey nê vîst serranê peyeyan di cemati ma di zaf gurey pili qewmiyayî. Bi nê guran exlaqî cemati ma zi vuriya. Normê exlaqî serdest û kolonyalîstan hîni welatê ma di, hezey verê bi hêz niyi. La belê hetanî Kurdistan azad nêba, ma tesîranê exlaqî kolonyalîstan ra nêxelesenî. Xelesay ra pey zi, cemati me hina vêsi mehtacê edelet, rîndey, tolerans, humanîzm û demokrasî yo.





Em li gor xwezayê diramin (difikirin) li gor qeydeyan dipeyivin, li gor adetan dilivin (hereket dikan).

Francis Bacon

Mi xwira gêj kerdibi

Payîz o. Inguri (hinguri) resaya. Wextê rez girenayışan o. Dewijî heme hedirêya rez girênayışan kenê û dest bide kerdo. herkes weladanê xwi (xo) şen keno. Dewijan a qorê taşterê re pey sandoxana xwi heran. bergîran wenanê şonê rezandê xwi miyan inguri qerifnenê. kenê sandoxandê xwi semedo ki rojo bîn cosera berê şeheran di biroşê. pê éhtiacyiyanê keyandê xwi temîn bikê.

Dewandê corî re yew dewij. taştarê re pey sandoxanê xwi herda xwi wene- no. o û keyna xwi. raşt ver a xwi danê rezdê xwi. Ki mîrdek û keyna xwi rezdê xwi miyan resenê. sandoxanê xwi herda xwi ra ronanê û dest bide kenê inguri qerifnenê. Ki sandoxê xwi pir kerdi. serê sandoxanê xwi pelmewî reydî gêne. dim ra he- ra xwi ancenê sandoxan miyan. sandoxanê xwi bide wenanê raşt vera xwi danê keye.

Rojo bîn mîrdek cosera sandoxanê xwi herda xwi wenano beno paporî ser. Tikekê (bîney) ra pey. qamîyon cor di yena.

mîrdek destê xwi hewaneno. Qamyonî taxdê jî di vindena. M'awîn qamîyon re peye beno. mîrdek û m'awîn tereydi sandoxanê inguri qamîyonî wenanê. dim ra qamîyonî ray kuwena. Ki şeher resay. mîrdek sandoxanê ingurda xwi ra pey. peranê xwi keno tonik da xwi. raşt vera xwi dano loqantî. Mîrdêk şono zedî loqantî di yew masa ver di roşeno. Tikêkê ra pey. garson


te geno ano masada jê ser o roneno. Mîrdek dest bide keno verê kebabê xwi weno. dim ra zî (jî) dest bi selatî keno ki boro. hewniyeno kî n'amkî (tebax) di çend hebî zeytûnî zî şermîtiyena. Mîrdek çend hewî çetela xwi dano zeytûn ro ki boro. tim zeytûnî çetel ver a şermîtiyena. Garson zî. dûrî ra temaşê mîrdekî keno. Garson hewniyeno ki. biya reqi-teqa mîrdekî çetel. zeytûnû n'amkî. Garson f'am ke- no ki mîrdek heqdê çetel û kardî ra nîno. Garson xwi zeft nêkeno. şono masada mîrdekî ver di vindeno. çetel û kardî mîrdekî dest ra gêno. vano:

- Be w n i xalo! Semedo ki zeytûnî nêşermîtiyo. kê verê kardî ana bi zeytûnê şanenê. dim ra kê çe-

tela xwi zeytûnî ro kenê wenê. Mîrdek garsonî ra vano:

Bira . mi zaten çend hewî xwi ra ya gêj kerdibiy.

**Hederkerdox:
Mihem Himbelij**



yeno masada jê ver. vano:

- Xalo kerem ki. ti ci nan wazenê. ez torê biyara? Mîrdek vano:

- Garson efendi. mi rî tay kebab û selatê biyari. Garson tikêkê ra pey derê kebab û selâ-

TEW LO LO...

Doğan Güzel

*JI ALİYEK VE SİLAH SEKİNİN, LÊ Jİ ALİYE DIN?....



TİR

Musa Anter



Pîr û ciwanê miletê Kurd

E zê ci bibêjim Apê Musa, dijmin dijmin e, ci bi destê wî were wê bi me bike. Dijmin yanî dewleta Tirk "zarokê li ser pêçekê kuştin, na- müs hingavtin, pîsî bi me dan xwarin, neynûk rakişan- din, diran hilkişandin, zindanê xwe yên genî, ji keç û xorêt me yên ciwan tîjî kirin." Lê belê hêvî, hêviya miletekî wek miletê Kurd ferma Tirk, nikare bikuje. Çendî dewleta Tirk zilm û zora xwe berdewam bike li hemberî miletê Kurd ê aştixwaz, wisa jî li hemberî vê çavşoriya Tirk refê keç û xorêt ciwan bi ser çiya dikevin û milê xwe didin pêşmergeyên qehreman, welat- parêzên azadîxwaz.

Apê Musa, çavê dewleta Tirk bar nebû ku, niştiman- perwerekî wek Apê Musa, nivîkarê pêşverû, şehîdê nemir rastiya (dewleta Tirk) zilm û zora wê çavşoriya wê li hemberî miletê Kurd bi cîhanê bide dîtin. Ji bo xebata miletê Kurd û xebata nivîkar û rojnamevanê azadîxwaz rawestine. Belê dewleta Tirk xewinroka ji xwe re bîne. Apê Musa tu şehîd kirin, berê hêviya te nehat kuştin, bi soz û peyman, bi Zerdeş û Avîsta, emê rêka te bigirin. Hêviya te roj bi roj di dilê miletê Kurd de mezin dibe. Ew lata te xwest ji binî de bihêri- vine wê bê hêrivandin, wê buhara miletê te li şûnê bê çandin, wê biçükê me roja Newrozê, gulê sor û zer li ser gora te bireşinîn, wê navê te li ser dilê xwe bikolin. Apê Musa tu namîrî, tu di dilê her Kurdê bi namûs de yî, tuyê her dem bîmînî simbola nivîkar û rojname- vanê Kurd.

Perwer Shamoo / Rûsyâ

Em tev Musa Anter in

Sal 1992

20'ê İlonê

Saet heş, rojekî reş

Sokratesê hemdem;

Militanê heftê û çar salî

Li paytexta Kurdistanê

Bi sê guleyên gemar û qirêjî

Kete erdê...

Hey waxx li min!

Bi xayıntî te birin.

Lê te neanîn.

Ji wan kirî te kuştin

Ji wan kirî te nehiştin,

Ji wan kirî Apê me rakirin ji holê.

Lo xwînxwamo!

Hûn zanîn ku, em bi kuştan zêde dibin.

Erê we dîsa bênamusîya xwe anî ziman.

We bedena wî berda erdê!

Tenê bedena wî

Ruhê wî û canê wî kete bedena me,

Pênuşa wî kete destê me.

Apê Musa bû deh, bû sed, bû hezar û milyon.

Bila xwînmijê wekî we bizanibin ku;

Em tev Musa Anter in;

Em tev Şêxoyê Zivingî ne.

Apê me, kalê me, kekê me, xalê me,

Mamosteyê hêja, zanyarê me,

Bila qet çavê te li paş nemîne.

Te ji bo gelê me û welatê me por spî kir.

Bizanibe ku...

Em neviyên te û xwarziyên te bi milyonan

Xwîna te û pênuşa te li erdê nahêlin...

*Li ser navê Ciwanê Welatparêz
Hemedê Kurtalanî / Adana*

Civîneke dîrokî bi bang û pêşkêsiya PKK'ê, ji aliyê partî û rêxistinê Kurdistanê ve li Şamê tê li dar xistin

Di riya yekîtiyê de gaveke girîng

Navenda Nûçeyan- Di tu demê de parti û rêxistinê Kurd wek van demên dawî, ew çend nêzîkî hew nebûbûn û ew çend hêviya yekîtiyê ji gelê Kurd re cenebûbû. Bir yara PKK'ê ya şerrawestandinê û piştî vê bîryarê, banga ku ji bo yekîtiyê li rêxistin û partiyêni Kurd kir, rê û imkanen girîng di warê yekîtiyê de deranîn rojevê.

Rêxistin û kesen heta hingê PKK'ê bi hişkbûn û râdikaliyê súcdar dikirin, li ber vê tewra PKK'ê tiştekî gotinê ji wan re nema û bi mecbûri guhê xwe dan vê bangê.

Di riya lihevkomkirina hézen Kurd û yekîtiyê de, gavê pêşî yê berbiçav hefteya cûyi bi protokola navbera PKK û PSK'ê hatibû avêtin. Di rojêni pêşya me de ji wê PKK bi hin rêxistin û partiyêni Kurd re, li Şamê civînekê li dar bixe. Ev civîna ku di derba pêşî de, wê tenê di navbera rêxistinê Kurd ên bakurê Kurdistanê de çêdibe, ji bo yekîtiyê pirr girîng tê nirxandin û wek bûyereke dîrokî tê dîtin.

Her çiqas ev civîn wek a rêxistinê bakurê Kurdistanê tê bi navkirin, li gor nûçeyen çavkaniyêni Kurd ji başûrê Kurdistanê ji berpirsiyarêni hin rêxistinê Kurd wê besdar bibin û bi vê civînê, wê gavêni girîng di riya yekîtiyê hézen Kurd ên çar parçeyêni Kurdistanê de bêni avêtin û wê bibe bingeh ji mecliseke Kurd a hemû parçeyêni Kurdistanê.


Li aliyê din, PKK bangêni xwe yên ber bi aşî û yekîtiyê ve dorfirêh dike. Bi mebesta şer û nêxweşîya di navbera hézen Kurd ên dîtincihê de bê rawestandin û hêza gişan li hemberî dagirkerî û imperyalizmê bike yek, PKK destê xwe yê aştiyê dirêjî hemû rêxistinê welatparêz dike.

Yek ji van hêzan ji rêxistina Hizbullah e. PKK, banga ku di destpêka meha Remezanê de li rêxistina Hizbullah kîribû û ji xwestibû ku, şerê navbera vê rêxistin û PKK'ê bê sekînandin, piştî cejna Remezanê careke din anî rojevê û berde-wamkirina şerrawestandinê ji, ji rayedarêni Hizbullah û hemû Kurdêni misilman ên welatparêz xwest.

Ev daxwaza PKK'ê bi bela-



Celal Talabani



Abdullah Öcalan

vokê hate daxuyanîkirin.

BANGA YEKÎTIYÊ

Di 30'ê Adara 1993'an de PKK-KN (Komîteya Navendi) ji bo raya giştî danezanek belav kir. Di vê danezanê de ji bo bîryara PKK'ê ya şerrawestandinê, rêxistin û tevgerêni Kurdistanî ev dîtin tê pêşkêskirin.

"Têkoşîna me ya rizgariya neteweyî ku bi pêşengîya PKK'ê tê meşandin, gihîştiye merhaleyeke bi hêztir û ketiye pêvajoyeke ku hîn ber bi serifaziyê ve dimeşe. Me ji daxwazîn raya giştî ya navneteweyî û gelê aşîfxwaz ê Tirkîyê û Kurdistanê ev bîryara şerrawestandinê a yekalî stand.

Armanca me ji vê, ji bo çareser-kirina pirsgirêka Kurd, vekirina riyîn siyasi ye. Bêyî ku em li ideolojîyen wan binêrin, me ji bo xerakirina politikayêni imperyalistan û mîtingehkarîn ên ji hev vejetîne, berî-hev bide û wan idare bike, bîtesîr bîhêle, em bi YNK û PSK'ê re rûniştin û me bi hev re protokolêni xebatê imze kirin.

"Komara Tirkîyê xwe mîna parçeyek ji İslamiyetê dide xuyakîn lê divê kes bi vê nexape.

"Bi vî awayî dixwaze hes-tîn (his) dînî yên gelê Kurd û Tirk istîsmar bike. Divê haya rêxistinê İslami tev ji vî aliyê Komara Tirk hebin û li şûna ku di refîn wê de cihê xwe bi-girin, li hemberî wê bisokinîn, têbikoşîn û nekevin faqîn wê.

"Heta iro ji xwest di bin navê Hizbullah de, bi PKK'ê re gelê Kurd bi hev bide kuştin. Di vî warî de, ne ku serifraz ji nebû. Ji ber gelek sedeman pirr xwîn hate rijandin. Di vir de, ne tu berjewen-diyan (menfeetîn) PKK'ê, ne yên Hizbullah, ne ji yên gelê Kurd heye. Ev şer, taktikîn fenek ên şerê taybetî ye û di xizmeta mîtingehkariyê de ye. Divê êdî em dawiya vî şerî bînîn. Em daxwazîn gelê xwe ji didin ber çavê xwe û di vê muhleta şerrawestandinê de tevî tevgera Hizbullah, gazi hemû tevger û rêxistinê Kurdistanî dîkin ku em tev bi hev re li hemberî vî dijminê hev-

par (şirîk) têkoşîn bidin. Em dixwazîn bê zanîn ku, bi men-sûbîn vê rêxistinê ci yên râyedar, ci ji yên lokal re hevdîtinan pêk bînîn. Em di vî warî de, li hêviya muhataban in û dixwazîn haya raya giştî ya serwext jî, ji vê rewşê hebe."

Vê hewldana PKK'ê ya ji bo berhevkirina hemû hézen Kurd, programma û politikayêni Komara Tirkîyê serobino kir. Li hemberî vê rewşâ nû dewleta Tirk nikare wek berê di qada navneteweyî de. PKK'ê bi terorîstî súcdar bike, her çiqas dev ji van súcdarkirina berne-daye ji, kes guhê xwe bi awa-yekî ciidî nade. Li aliyê din ri-

ya bihevdûkuştina Kurdan li ber dewleta Tirk tê girtin. Rêxistina Hizbullah ku heta vêga ji aliyê dewletê ve dihate bikaranîn û birayêni xwe yên Kurd ên welatparêz dikuştin. Ji niha vê hêdî hêdî bi ser xwe ve tê û xuya ye nema guhê xwe dide dewleta Tirk û êdî naxwaze bibe listika vê dewleta dagirker.

Li gor nûçeyen gihîştine me, rêxistin û partiyêni ku wê bi awayekî aktif beşdarî civîna li Şamê bibin, ji xeynî PKK'ê, PSK, PDK, KIP, Yekîti. Kawa û çend grûbîn biçûk in. Bes rastiya vê nûçeyê bi temamî nehate teydkirin.

Talabanî hate Enquerê

Navenda Nûçeyan- Serokê YNK'ê Celal Talabani, ji bo ku bi rayedarêni Tirkîyê re têkiliyêni siyasi deyîne, roja 3'ye Nisanê hate Enquerê. Rayedarêni dewleta Tirk, ji roja banga şerrawestandinê PKK'ê û wirve, li benda serdana Talabanî bûn.

Çavdîr û pisporêni siyasi, serdana Talabanî bi şerrawestandinê PKK'ê ve girê didin. Li gor derdorêni siyasi, Talabanî bi vê serdana Enquerê wê nirxandina rayedarêni Tirk a li hemberî banga Abdullah Öcalan bistîne, tewr û programen Enquerê yên di vê mîjarê de hîn bike û pêşniyariyêni xwe pêşkêşî rayedarêni Tirk bike.

Serokwezîrî Tirkîyê Suleyman Demirel, wê di rojîn 4-7 Nisanê de, bi Talabanî re li meqamê xwe rûnê, pêşniyaran guhdari bike û dîtinêni xwe pêşkêşî wî bike.

Piştî Demirel, Özal ji wê bi Talabanî re hevditine-ke fermî bike û lê guhdarî bike.

Li gor nûçeyen çavkaniyêni başurê Kurdistanê, wê Talabanî ji Enquerê derbasî Washington bibe û bi rayedarêni Amerîki re ji li ser pirsgirêka Kurdi wê bepeyive û serdana wî hate 20'ê Nisanê wê dom bike.

"Armanca ew e ku, di rojêni pêşya me de, hemû hêz û rêxistinê Kurdistanê di vê refî de cihê xwe bigirin.

"Em dixwazîn tevgerêni Hizbullahi ji daxîlî vê refî bi-kin. Em bawer dîkin ku, şerrawestandinê meha Remezanê ji bo vê, wê bibe zemîn.

"Komara Tirkîyê ya şoven û nîjadperest çawa do dijminê olê (dîn) bû. iro ji wiha ye. Komara Tirkîyê dijminatiyeke gelekî qirêji li hemberî gelân

Li Qesra Çankayayê pirsa Kurdî

Navenda Nûçeyan- Her cîqas bi devkî û bi awayekî eşkere nabêjin jî. rayedarên dewleta Tirk, hêjî şok û tesîra banga Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan a şerrawestandinê li ser xwe neavêtine. Niha hewl didin xwe ku, xwe ji şoka rawestandinâ ser a yekalî xelas bikin û rojek ji ya din zûtir. ji vê rewşê istifade bikin. Ji bo vê ji, rayedarên dewletê, ji aliyekevî ve dibêjin PKK, çîma ku rîexistineke terorist e wê muhatap û teref qebûl nakan. lê ji aliyekevî din ve ji, vê şerrawestandinâ PKK'ê wek fersendeke dihesibînin û ji bo jê istifade bikin di nava xwe de civînan bi dizî, li pişteriyan û li ser biryara PKK'ê nirxandinan dikan. Lê bi temamî ji nizanîn çî bikin: ji ber ku siyaseteke wan a sabît û kifskîr tune.

Dizanîn bi politikayê zilm û zorê heta niha tiştek bi ser tiştekî nexistine, divê dev ji van politikayê berê berdin, lê politikayeke wan a nû ji, ji bo vê rewşa nû di destê wan de tune. Ev banga PKK'ê ku ji nîşka ve xwe derxiste rojevê, dest û pê li wan girê da û ew gêj kirin. Dizanîn pêdiviya wan bi siyaseten nû heye, lê yên ku di mejiyê wan de pêşniyarên nerm ên çareserkinîna pirsa Kurdi hene ji, gotinê xwe bi rengeki vekirî



Özal di pirsgirêka Kurdistanê de ji rayedarên dewlet cihêtir difikire li bi temamî ji vekirî xeber nade.

naynîn ziman. Nikarin bînîn ziman ji ber ku, ditîrsin û neŵîrin xwe eşkere bikin.

Heta niha gotinê herî tûj û vekirî ji devê Serokkomarê Tirkîye Turgut Özal, derketîne, lê gotinê wî ji piir bi tedbir, bi tirs, hinek ji bi rengeki îndîrek (nerasterast) ji devê wî derdikevin.

Bes, teví ku Özal zêde neŵîre pêşniyarên nû bi şeklekî eşkere li ser pirsgirêka Kurdi

bîne ziman, dîsa ji bi desteka Amerika be ji, car caran gotinê wek rakirina "Rêveberiya Taybetî" "Federasyon" û hwd. telafûz dike û dixe rojeva Tirkîye.

Di civîna Çankayayê de ji Özal nîşan da ku, ji rayedarên din hinekî din pêşvetir e, di vê mijarê de.

30'yê Adara 1993'an, roja Sêsemê ji bo nirxandina banga şerrawestandinâ PKK'ê, ji

rayedarên dewleta Tirk, Serokkomar Turgut Özal, Serokwezir Suleyman Demirel, Alikarê Serokwezir Erdal Înönü û Serokê Hêzêن Leşkerî Orge-nâral Doğan Gureş, li Qesra Çankayayê hatin cem hev û civînek li dar xistin. Di civîna ku saetek nîv dom kir de, rewşa nû, Newroz û dema piştî Newrozê hate nirxandin.

Li gor nûçeyen der heqê ci-vîna çaran de, gîhîstine destê

me, Özal bi civîneke wisa hewl daye xwe ku, dîtinê xwe bi Demirel, Înönü û Gü-reş bide qebûlkirin.

Dîtin û pêşniyarên ku Özal di civîna Çankayayê de pêşkêş kirine, bi kurtî ev in: "Lazim e atmosfer û şertên dijwar û germ ên herêma Kurd lê dijin, ji holê bén rakirin û hewaya aşî û sukûnetê li wir bê rûnişandin û bi cihkirin.

"Ji Rêveberiya Taybetî ku li herêmê tê tatbikkirin heta niha encameke pozitif nehatîye standin."

Bi van gotinê xwe Özal di-de xuyakirin ku, ev sîstema leşkerî ku di dema serokwezir-tya wî bi xwe de, li Kurdistanê hatiye bicîhkirin, ji zerar pêştir tiştek nedaye dewleta Tirk û rakirina vê sîstemê ji ber vê yekê pêwist e.

Di dawîya civînê de, li ser pirsa rojnamevanan Demirel ji wiha peyi: "Li gor nirxandina ku me di civînê de kir, kîfxweşî heye.

"Helbet xwînrijandin mîletê me xemgîn dike, ji ber vê yekê em ji wan re dibêjin bila werin xwe bispérin edaleta Tirk."

Li ser pirsa der heqê ope-rasyonê biharê de ji Demirel wiha got: "Niha şertên ope-rasyonê tun in li holê."

Turkiye ser dixwaze

Dewleta Tirk, tenê ne di şert û hoyen cengê de, di dema aşî û şerrawestandinê de ji, tewra xwe ya zordarî û xwînrijiyê didomîne.

Li aliyekevî dide xuya kirin ku, şerrawestandinâ PKK'ê tewreke baş e, di ber re ji dema fersend dikeve destê wê hezên xwe bi ser gerîlayen PKK'ê yên li gor banga Apo şer rawestandinê, dişine û wan dikuje.

Çend bûyeren piştî şerrawestandinê vê tewra dewleta Tirk dertînê meydanê. Roja 29'ê Adarê, hêzênen dewletê li nêzîki Kemaliye bi ser grubek gerîla ve digirin û çar heb ji wan şehît dikevin. Li Pasûrê (Kulpê) disa gerîlayekî ARGK'ê ji aliye hêzênen dewletê ve tê şehîtkirin. Li du-sê deveren din ji hêzênen dewletê bi vî rengî, ji şerten şerrawestandinê istifade kir û eriş bir ser gerîlayen ARGK'ê. Ev erişen dewletê bêhna gelê Kurd teng dikin. Ji ber vê yekê roja 28'ê Adarê li Dersimê gel kepengen xwe girtin û dewlet protesto kirin.

Cerdevanan gundek xera kirin

Navenda Nûçeyan- Cerdevanan (korucu) dîsa êrîşî ser gundekî kirin. Çar mal şewitandin, derî û şebekeyen (pencere) malan şikandin.

Roja 26' Adarê li gundê Hezexê (Îdîl) cerdevanen Aleqemşê xwestin ku, keriyê pezê Xirabosiniyan talan bikin. Bi hawara şivanan re di nav gundi û cerdevanan de şer derket. Leşkeran bi panzeran mudahaleyî şer kirin. Piştî ku gundi ji gund dûr xistin, cerdevanen Aleqemşê û Hacîkesen ketin nava gundi. Nêzîki 60 cerdevanî deriyen û pencereyên Ali Yiğit, Yusuf Yiğit, Ebuzet Keskin û Şemsettîn Keskin şikandin.

Eşyayê malê yê giranbûha, sa-

rinc, televîzyon û dolab şewitandin. Navên cerdevanan ên ku gundiyan tesbît kirin ev in: Osman Ay, Bozo Ay, Şerîf Ay, Hesen Ay û Sadîk Ay...

Di nav Aleqemşî û Xirabosniyan de ji bo daweyekê erdê, dijberî çebûbû û berî bi 20 salan di nav herdû gundan de şer derketibû. Di vî şerî de, ji herdu gundan 7 kes hatibûn kuştin. Ji wê rojê û heta niha, dijminatiya di nav herdu gundan de didome.

Berî bi demekê ji Aleqemşê Abdurrahman Ay, ji aliye gerîlayen ARGK'ê ve, piştî pirsyariyê ve, hatibû kuştin. Abdurrahman Ay, ji kuştina 9 kesan mesul dihate dîtin û di iîrafen xwe de ev idîa qe-

bûl kiribûn.

Piştî kuştina Abdurrahman Ay, ji Xirabê-sosina Yusuf Yiğit, Alî Yiğit, Mehmet Yiğit, Salîh Yiğit, Ebuzet Keskin, Şemsettîn Keskin û ji Qerexirabê ji Mehmêt Demir (60 salî ye) û Abdullah Demîr hatibûn girtin.

Şemsettîn Keskin, Ebuzet Keskin, Yusuf Yiğit û Mehmet Yiğit, di heşte meha Kanûnê de hatin tewqîfîkirin û hê ji di girtîgeha Merdînê de ne. Ev her çar kes, li gor idîaya mehkemeyê ji bo aîkariya gerîla hatibûn girtin.

Şeva 28'ê Adarê Cizîrî li ser ban bûn

Di şeva 28'ê Adarê de bi ketina tariyê re gelê Cizîrê hilkişyan ser banen xwe.

Ji ber ku, ew roj rojeye pirr girîng bû di diroka gelê Kurd de. Ew roj roja salvegara şehîtbûna Egitê PKK'ê Mahsum Korkmaz bû.

Egit tam berî heft salan li ciyayê Gabarê şehîd ketibû.

Di rojeye wisa girîng de, gelê Cizîrê bi derketina ser bîn û qîrqirina sloganan Mahsum Korkmaz hate bibiranîn.

PÊNÛS



Amed Tigris

Sîstema Skandînavyayê ya mînak ji binî ve diheje

Pirraniya dewletên kapitalist û yên dinyaya sêyemin, sîstema Skandînavyayê ji xwe re wek mînaka heri baş digirtin û nîşan didan. Demekê li Tirkîye jî, li ser modela Skandînavyayê gotübêj çêdibû. Bi taybetî Bülent Ecevit dema ku, dixwest ew bibe sosyal demokrat, ew heyranê modela Skandînavyayê bû. Xwedégiravî wî dixwest ku li Tirkîye jî wek sîstema Skandînavyayê, sîstemeke çêbîke. Di dema belavbûna Sovyetê de jî, Gorbaçov û hevalen xwe gelek caran diyar kirin ku, ew dê wek sîstema Skandînavyayê sîstemeke ji xwe re hilbijîerin. Di nava welatên Skandînavyayê de jî, bi taybetî modela Swêdê ji xwe re model digirtin. Daxwaz û hewlidan ew bû ku, ji sîstema sosyalist vegerin sîstema Swêdê ya sosyal demokrat. Lé, xwedê ji Gorbaçov û hevalen wî re li hevdu ne anî û Yeltsin bû belayê serê wan û ew bi ber Amerika ve birin. Di dawî de, ne ber bi Amerika ve cûn û ne jî ber bi Swêdê ve. Li rasta Moskovayê, li ba sar û sermayê man. Qerisin û reqisîn...

Lé, niha li Skandînavyayê û dîsa bi taybetî li Swêdê rewşa sistem an jî modela Swêdê ci ye? Ez bawer im ku, gelek kes ji van welatên cemedê yên biçük biçük, ne agahdar in ku ci li wan diqewime. Bi tevayî Skandînavya, di krîzeke aborî ya kûr de diji. Ez dixwazim hinek li ser rewşa Swêdê rawestim ku Swêd pêşengê dewletên Skandînavyayê ye.

Ev du sal in ku Swêd ketiye nava krîzeke aborî û civakî. Hikûmeta koalîsyona ku ji muhafezekar û liberalan pêk tê, dînamîten Nobelê kirin bin sîstema Swêdê. Sistem li ser hilweşandinê ye.

Niha li Swêdê bêkarî %7,6 e. Ji nîv milyonî bêhtir bêkar hene. Her ku diçe zêde dibe. Di navbera salekê de, sê cari qîmeta pereyê Swêdê ket. Eksport (îhracata) û importa (îthalata) Swêdê gelek kêm bûye. Cihê kar, her roj têng girtin. Karker û xebatkar ji kar têng derxistin. Destmiz û measê karker û xebatkaran wek xwe ye, zêde nabe. Kirêya xaniyan îsal di carekê de %7 bilind bû. Sazgehê xaniyan ên dewletê firotine seksan. Ji vir şûn ve di dora xaniyan de rawestandin ji bi pere be. Qanûnê nexweşiyê guhartin. Ew kesen ku ji meha nîsanê pê ve nexweş bîkevin, dê heqên sê rojén xwe yên pêşî nikarin bistîn. Rojén din jî, %80 dê bêye dayin. Mesrefa li nexweşxanan zêde kirin. Li Swêdê ji 80 zimanî zêdetir di dibistana de perwerdeya zimanê biyanî heta niha dihatin kirin. Sistem ji binî ve hat guhartin. Payîza ku bê %50 zimanê zîmkâk kêm dibe. Talûkeya ji binî ve rabiûnê jî heye. Swêd dixwaze biyaniyan (xerîban) asîmîle bîke. Heşt mîyon kes li Swêdê dijîn. Mîyonek jê biyanî ne. Swêd, dixwaze mîyonek biyanî di nava xwe de bîhelîne. Kal û pîrén Swêdî, êdî nikarin bi maeşê xwe yê teqawîdiyê idare bikin. Hejmara zarokxaneyan teslimê şirketên pirîvat (sexsi) bikin. Hejmara pirtûkxaneyan (kutupxanan) kêm kirin. Belediyeyen Swêdê bi hevdu re ketine hemberiyê û kembera aborî teng dikin û dişidîn. Ew cûndinê xwe yên sosyal kêm dikin. Bihayê tiştan bilind dikin. Xizmetên xwe bi tixûb dikin.

Dixwazim dem û dezgehê dewletê bifroşin û bidine seksan. Baca (vergiya) şirketên mezîn kêm û yên karker û xebatkar jî zêde bikin.

Heger wiha dom bike dê di demeke gelek kurt de, sîstema Skandînavya û ya Swêdê winda bibe. Wek sîstema sosyalist ku niha di şûna wê de gur dizûrin. Kundên kor bang dikin. Dê ji Almanya û Amerika jî xerabtir bibe.

Dîroka peyveke Kurdî: Hêşîn

Selmanî

Bi Kurmancî reng pirr in: sor, reş, spî, boz, zer, qîcik, kesk, hêşîn... Hêşîn bi xwe peyveke balkêş e: Gava ku em dibêjin "hêşîn", du reng têng aqilê me; yek ji wan kesk e ('yeşîl' bi Tirkî), yên din jî rengê avê û esman ('mavî' bi Tirkî). Ev yek çawa çêbû?

Eger em eslê vê peyvê dabaş bikin, divê ku ji destpêkê ve em çewtiyekê sererast bikin. Însan hene, eger ji wan bipirsî, ku ev peyva hanê ji ku tê, wê bibêjin te ku "hêşîn" şeklekî rizî (kambax; wêranbûyî) ji peyva Tirkî "yeşîl" e. Kitêba Doğu Anadolu Osmanlıcası jî wisa dinivise. Lé belê divê ku em vê bûyerê ji ber çavên xwe winda nekin ku, armanca wê pirtûkê ev e: Înkarkirina hebûna zimanê Kurdi û îspatkirina ku ev zimanê rind şêweyekî Tirkî ye. "Yeşîl" bi xwe bi peyva "yaş" ve (şîli) girêdayî ye; çimkî li ku derê şîli hebe jî, hêşînatî jî hene. Bi rastî, tu pêwendî di navbeyna "hêşîn" û "yeşîl" de tune.

Ji bo lêkolîna dîroka peyvekê, divê ku em hemû şeklîn wê berhev bikin. Şeklîn "hêşîn" yên din bi şêweyêne me ev in: hêşîn (li gora Ferhenga Kurdoev û Ferhenga Bakaev); hêşîn (li gora Ferhenga Musa Anter û bi şêweyêne rojavayê Kurdistanê, wek Adiyaman /Semsûr): şîn (ba-

sûrê Kurdistanê: bi Kurmanciya Botanî û Behdinanî û bi Soranî). Bi Dimili (Zazakî), peyveke din tê bi kar anîn: Kiho. Ya ku bala me dikişîne ev e; ku heşîn jî û kiho jî, bi du peyvên Asûrî (Mexînî) re jî -yaqûra û mîla- her çar jî xwediyê du wateyê (maneyê) eyîne: Yeşîl (kesk) û mavî! Em karin bibêjin ku bi, hemû zimanê Kurdistanê (ji Ermenî û pê ve), ev du reng ji hev nayê cuda kirin. Ev yek gelek ecêb e, nemaze ji ber ku li Wanê, cinsekî pisikan ê spî heye, ku çavekî wan kesk e û çavekî wan ê din jî hêşîn (mavî) ne. Gelo bi Kurmancî em karin bibêjin ku çavekî wan hêşîn e û çavekî wan ê din jî hêşîn e!

Em binihêrin gelo İranolog, der heqê vê peyvê de ci dibêjin! İranologe Norwecî Georg Morgensterne dinivise ku "bi zimanê Iranî (ango Avestayî, Farisiye kevin, yên navîn, yên nûjen, Paşto, Balûci, Kurdi hwd.) û Hindistanî (ango Sanskrîtî, Hindî-Urdû, Bengalî, Nepalî, Gûcaratî, Marathî hwd.) peyiv ên bi wateya (me'nayê) 'reş', 'hêşîn (mavî) û 'kesk' gelek caran têng bi hev guhertin." ("Notes on Balochi Etymology", Norsk Tidsskrift for Språkvidenskap, 5 (1932), rûpel 50).

Vê gavê, rewşa ku em li Kurdistanê dibînin, bi zimanê din ên hev esil jî kifş e. Dîroka hêşîn jî ev e: Bi

zimanê Skîtan (bi Ingîlîzî "Scythians"), peyveke 'axşen' hebû û em dizanîn ku bi zimanê Avestayî ji peyveke 'axşayna-' (axsaina) hebû, herdu bi maneya "rengê zacê 'mavî'" (bi Tirkî: Mavî zacîn veya zaçayağının rengi; bi Ingîlîzî: color of blue vitriol). Ev reng jî wer rengê ava behrê ye: erê, navê Behra Reş (Karadeniz) ji bi Yewnanîya kevn Euxinos (bilîvkirin: Ew-ksinos) e, ku ji Axeinos (bilîvkirin: A-kseynos) hatibû guhertin. Ev 'Axeinos' ji Axşenê Skîtiyan bi eynî ye! Lé cîma hatibû guhertin? Ji ber ku bi Yewnanî, peyveke 'ksenos' heye, bi maneyê biyanî (xerîb); xurdepêsa (pêşdank- pêşpirtik) 'a-' ji bi maneyê bê (Tirkî -siz) ye.

Ev peyva Skîti li gora guhêñ Yewnanan, bi maneyê "bê biyaniyan" ango dijî mîvanan (= Yewnanan) bû: bi Yewnanî xurdepêseke 'eu-' jî heye, bi maneyê xweş. Wana a-kseynos guhert bi e-u-ksenos, ango 'xweş mîvan' (misafirperver).

Ji Skîtiyan dîsan ev peyv bi Pehlevî, ango bi zimanê Farisiye yê navîn, hat xuyanê bi du şeklan; xaşen û axşen. Bi zimanê Farisiye yê nûjen, 'xeşîn' ji holê rabû, xêñ ji navê teyrekî: xeşînsar (ango: heşîr ser, serê heşîn). Bi şêweyên Iranî ku, li ciyayê Pamîr têng qisekirin jî, dotmamên peyva me hêşîn hene: bi Yîdxa (Yîdgha) axşin= "mavî"; bi Ormûrî jî şîn-kesk yan "mavî". Bi Paşto jî, ku ji zimanê Afganistanê û Pakistanê ye, peyveke şîn heye, bi herdu maneyê ku li cem me heñe kesk û mavî.

Em nikarin înkâr bikin ku peyva me 'hêşîn' dişibe peyva Tirkî 'yeşîl'. Lé belê, eger em dixwazin zimanê xwe bi awayekî ilmî dabas bikin, divê ku em bîkevin bin dîroka peyvan û eslê wan û bi şîbîna wan a sethî têr nebin!



Şoreşger heval Yıldırım Bîlgîn (Hesen)

Ew bi hevalen Cûma û Weysi re li Siwêrekê gelekî zû ji nava me vejetiya û cihê xwe yên bi rûmet di nava şehîden Kurdistanê de girt. Hevalê Hesen, gava bi şoreşgeriya xwe tîrs û xofê dixist serê celladên însanan, wiha jî di çavê gelê xwe û havalên xwe de dibû sembola berxwedanê. Em soz û peymanê didin hevalen xwe ku, emê jî di vê riyê de xwîna xwe teví xwîna wan bikin.

Li ser navê hevalen wî yên têkoşînê Bermal, Berwar, Hemîd

Talankirina çanda Kurdi çawa dest pê kir?

Gelek dengbêj, nivîskar û hunermendênu ku dibêjin em Kurd in, hê bi Tirkî dibêjin û dinivîsin. Xayîntî ne tenê yek rahêje çekên dagirkeran û bibin cerdevan. Xayîntiya herî mezin a rewşenbir û hunermendênu ku dûri eslê xwe ne.

Jîr Dilovan

Piştî ku qedexekirina li ser zimanê Kurdi piçeki sist bû. pirtük, kovar û rojname yên bi Kurdi hatin capkirin. Vê çapkiranê tiştek bi me da xuyakirin: "Talankirina çanda Kurdi."

Weke tê zanîn, axa Kurdistanê. cihê şaristaniya herî kevna-re ye. Ji ber vê yekê, ji aliyê cêki-rina pir, xan, himam û avahîyan ve gelekî pêşketî bû. Li Rojhilata Navîn, berî her derî li Kurdistanê zanîngeh (université) hatine avakîrin. Li **Nisêbinê Maryaqub** û li **Ruhayê Zanîngeha Herranê**.

Çanda Mezopotamya, bandorî li ser çanda Misir û Ephesusê (Efes) ji kiriye. Wê çanda, ges û pêşketina Kurdistanê, bala hemû dewletên cîran dikişand. Ji vê yekê Kurdistan û gelên Kurdistanê, gelek caran dibûne hedefa êrîş û qirkirinê dewletên din. Di wan êrîşan de, hebûn û dewle-mendiya Kurdistanê dihate talankirin. Kevir li ser kevir nedîma û her der dibûn kavil.

Ez dixwazim werim ser êrîş-keren dawî. Osmani û KT'ê (TC). Dema ku pêşiyen Tirkan Oxizi, ji navenda Asyayê koçber bûn. û ha-tin, gelê Kurd li ser axa xwe ji mîj ve cih girtibû. Dû re Kurd û Oxizan misilmantî pejirandin. Oxizi bi êrîşan li hemberi Kurdan tu carî bi ser neketin. Lî piştî misilmantî, bi alîkariya Kurdan. li Deşta Melezgirê Oxizan reda Bi-zansiyen birin. Deriyê Anadolê ji Tirkan re vebû.

Dema Osmaniyan, dewlet ne bi navê neteweyekê bû. Her herêmek bi navê gelê wir dihate ziman. Cihê Kurd lê dijin Kurdistan bû. Cihê Ereban Erebistan û

cihê Lazan ji Lazistan bû.

Êrîşen Osmaniyan ên li ser Kurdistanê, bi Yavuz dest pê kirin. Di 1875'an de, di dema Mahmudê Duyemin de, bi Hafiz Paşa û bi Çerkez Reşit Paşa, ho-vîtiya Ereban gelekî li paş hîstîn. Di vê demê de, Rojhilata Navîn di bandora çanda Ereban û İslâmî de bû. Lî gelê Kurd, edetîn ku ji Zerduştiyê girtin disa berdewam dikirin. Ji van edetan a herî girîng cejna Newrozê ye. Di 1992'yan de, Newroza 2604 an hate pîroz-kirin. Di mîvantî, dawet û serdan-an de, jîn û mîrê Kurd bi hev re rûdinê. Bi hev re govandan di-gerînin. Di çanda Kurdi de, cihê pîrekî bi rûmet û girîng e. Jinêñ Kurdi di her karî de bi mîrê xwe re ne. Gelek caran jinêñ Kurdi, mezinatiya ël û eşîran kirine. Weke dema Komara Mehabadê. Edîla Xan. Xatûna bi nav û deng... Di çanda Kurdi de gelek mîrênavbilind bi navê diyîn xwe têne nasîn. Weke Eminê Perixanê. Emê Gozê. Evdalê Zeynikê hwd. Bi kurtasi em bibêjin, çanda Kurdi, li hemberi çanda Ereb û İslâmî li ber xwe lap veda. Heta dema KT (TC).

Talankirina çanda Kurdi, di dema KT'ê de bi awayekî hovane, gelekî pêş ket. Di dawiya dema Osmaniyan de, zanyariya netewe-yî li hînek rewşenbirêن Tirk dest dabû. Wan rewşenbiran, bi navê "Jon Tirkan" honakekê pêl anî-bûn. Piştî ilankirina Meşrûtiyeta Duyemin, gelên nava Osmaniyan ji, honakînetewe-yî bi kar anîn. Rewşenbirên Kurd, li Stenbolê bi navê "Jin" kovarekê derxistin û xwe li dora wê dane hev.

Piştî Şerî Cihanê yê Yekemîn, dewleta Osmaniyan têk cû. Mus-tafa Kemal derbasî Anadolê bû. Li Sêwasê û Erzeromê bi gire-girîn Kurdan re komcivîn çekirin. Bi navê İslâmî, hemû xapan-din. Got: "Kurd û Tirk bi hev re xwedîyê vê axê ne. Alîkariya min bikin, ku em bi ser kevin, emê maşen we ji bi we din." Gelê Kurd li Gurgumê (Maraş) û li Ruhayê (Urfa), bi lehengiyeke mezin Fransiyen kirine der. Bi stranê "Lêxin lawêñ Kurdi roja namûsê ye" dîrok neçîsandin. Ev stran dû re bû "Lêxin lawêñ Tirk..."

Dema Kurd û Tirk bi ser ketin. Mustafa Kemal sozê xwe zû "ji bîr kir". Maşen Kurdan avêtîn bi sun guhê xwe ve.

Edî gelê Kurd, li hemberi wê neheqîyê, dest bi serhildanen kir. Serhildanen Şêx Seid. Agîrî.

Filma 'Klamek ji bo Beko' Xelata Jurî ya Taybetî stand. Filma Klamek ji bo Beko, di Festîwala Film a Navneteweyî de, di beşâ pêşbazîyê de hate pêşkêşkirin, û xelat stand. Festîwala, di mîjuya 18-28'ê Adarê de li bajarê Strasbourg, ya Fransa li dar ket. Ev xelata ku 'Klamek ji bo Beko' standîye, wekî xelata duymîn a festîwale tê pejirandin.

Wekî din film, 15 hezar frang ji stand. Bi van encaman film, serkeftineke baş di festîwale de bi dest xist.

Nizametîn Arîç, hem filma Klamek ji bo Beko, bi rê ve bîriye û hem ji wek serlistikvan tê de leyîstiye. Nizametîn Arîç, dema ku derneketi-bû Ewrûpayê, li welêt hem stranbêjiyê dikir û hem ji listikanê sînemayê bû.

Ev film berê ji, di Festîwala Venedikê ya film de û di Festîwala Toronto de hatibû nîşandan. Temâşevan eleqyeke bas nîşanî film dabûn. Li aliyê din disa di festîwala filman de, ya ku li bajarê Fransa. Angersê hatibû li dar ketin; filmê

cil roj û cil şevî ka nexwariye.) Nîşeyeke wilo li me gihadin ku, jê mirîtir, bêesiltir û sersartir tune bû. Ew nîfîs weke celebê (keriyê) mîşin sevekorî bû. Wê nîfîs, xwe ji Tirkan bêhtir Tirk dida xuyanîkirin. Dagirkeran li vê nîfîs dinêriyan û devêwan ji kîfan di-gîha pişt stûyêwan. Edî dest avêtîne zarokênd Kurdan. Li dibista-nan kom kirin û serê wan şüttin. Ev zarokênd ku li wan dibista-nan bi jehra kemalîzmê hatin da-girtin, dest bi muzik û wêjeya Kurdi kirin wergerandin Tirkî.


Di wêjeyê de **Nefî, Fuzûlî, Ziya Gökalp, Orhan Kemal** û **Yaşar Kemal** cîgas cîrok û e-posen (efsane) Kurdi wergerandîne Tirkî. İro ji gelek nîşkarîn ku bi eslê xwe Kurd, bi Tirkî dinivîsin.

Rewşa muzîka Kurdi hîn xirab-tir e. Wergerandîna muzîka Kur-di, bi xwefiroş **Celal Güzelses** dest pê kir. Mustafa Kemal ji, serê wî mezin kir û hestîkin avêtîn jê re. Got: "Tu bilbîl şerqê yi." Wi ji got: "Nexwe ez bûmî tişteki mezin..." Cîgas dîlok û stranê Kurdi hebûn bi peyvîn genî wer-gerandin Tirkî. Ji Ruhayê **Mu-kîm Tahir û Hemzayê Keçel** (Kel Hamza) ji dane du sopa Celal. Dagirkeran her sê dianîn cem hev. Berdidane pozberî hev. Edî ji ber ku li hev zêde bikin, hê bêhtir dîlok û stran didane hev û bi peyvîn Tirkî digotin. Navê wê ci-vînê ji "Meclisa Hunermendan" danibûn.

Mixabin, iro ji cêlikên Celal. Mukîm û Hemza pîr in. Weke **İbo, Emrah, İzzet Altınme-şe, Hüsamettin Subaşı, Se-lahattîn Alpay û Beşîr Kaya** hwd.

Gelek dengbêj, nîşkar û hunermendênu ku dibêjin em Kurd in, hê bi Tirkî dibêjin û dinivîsin.

Xayîntî ne tenê yek rahêje çekên dagirkeran û bibin cerdevan. Xayîntiya herî mezin a rewşenbir û hunermendênu ku dûri eslê xwe ne.



Gelek nîşkarîn, wek Yaşar Kemal ji motîvîn cîrok û efsaneyêñ Kurdan fîde dîline û di berhemîn xwe de bi kar anîne.

Klamek ji bo Beko Xelata Jurî ya Taybetî stand



Nizametîn Arîç, hem filma Klamek ji bo Beko, bi rê ve bîriye û hem ji wek serlistikvan tê de leyîstiye.

Klamek ji bo Beko hatibû bijartin û film eleqye-ke mezin ji temaşevan dîtibû.

Mijara filmê Nizametîn Arîç, li ser rewsa Kur-dan e. Cîroka film li ser miroveki ku naxwaze he-re leşkeriya dewleta Tirk û li ser kekê wî, hatiye honandin.

Beko ji bo ku birayê xwe Cemîl bibîne dide dû û derbasî Binxetê (Sûriye) dibe. Lî tê girtin. Cîrok bi xwe re di dema revê de serpêhatiyên Beko tîne zîmîn. Beko li dû Cemîl dice Sûri, ji vir derbasî nava başûre Kurdistanê (Iraqê) dibe û ji vir ji penaberî Almanyayê dibe bi awayekî pênaberekî siyasi.

Di vê gera Beko de, temaşevan rewsa Kurdan a trajik bi awayekî xwerû dibînîn û xedariya Se-dam a li ser Kurdan ji té ber çavêwan.

Filmê Klamek ji bo Beko li Ermenistanê hatiye kişandin. Listikanen film, bi pirrani ji Kurdên Er-menistanê ne. Film bi Kurmancî ye û ev cerbîna yekemîn a Nizametîn Arîç e.

Zana Farqîni



Riyek dirêj

Riyek zirav dirêj û dûr.
Pêd dimeşim b'qelem û şur.
Digerim li bircê bilind
Xwe berdidim newalên kûr.

Roj. bist û yekê Adarê
Gul bişkivîne bi carê.
Newroz bi can kirin pîroz
Ew in kuşlîkên biharê.

Hilm û kelgerma havînê.
Tînê ji cengê distinê
Dilêm şewti agir péket
Ket nav leyelanî rivînê

Tebax hatî. gurr bû agir.
Rûpel ji dîrokê vekir.
Ji Kurdan re bûye zayîn
Sevatarî li me rohnî kir.

Sal zivîrî. hat payîz xêr.
Şer germ bûye. li jor û jêr.
Rabin rabin êdi bes e.
Bîcûk- mezin û jin û mîr.

Berf û serma zivistanê.
Ba û bahoz. vê tofanê.
Gule baran tev di barin.
Li ciyayê Kurdistanê

Edî me nabê bindestî.
Mi jiyanek nû dixwestî.
Ez nema dozê berdidim.
Kêr gihayê goşt û hestî

Ger çiqasî ew bûha bî.
Tucarî bê welat nabî.
Nayê kîrrîn. tê standin
Bona ku gel tev pê şâ bî.

Adar Jîyan



Lehengê Omeriyan Piling (Ferad Yıldırım)

Jîr Dilovan

Hevalê min. roniya çavê min.
Pilingê min!

Bejn û bala te ya weke şitlekî
rihana avdayî li ber çavê min e.
Bejn û bala te ya gewr û çavê
te yên reş û belek. çawa ji bîr
bikim?

Tu di sala 1973 yan de hatî
dinê. Tu hê şazde salî. di bîhara
emrê xwe de ketî nav refê le-
heng û egîdan. Di demeke kurt
(kin) de. tu bûyi pilingê ciyayê
Stewr û Nisêbinê. Dengê livba-
ziyê te li çarmedorên Kurdish-

tanê belav bûn. Tu tî mayî birçî
mayî. Te sîr û serma. cemed û
seqem dît. Gurçikê te serma
girtibûn. Te pirr ji wan gurçikan
kişand. Lî te. tu carî doz û xe-
bata xwe ranewestand. Hevalê
te hê bêhtir bi. te geş dibûn.
Lew te tev û qolinc û eşâ gur-
çikê xwe dida pêsiya hevalê
xwe û tu di ketî şerê çekdarî.

Pilingê min.

Gelo niha tu li cem Cuma.
Çekdar. Heqî û Botan wan i?
Tu niha bi wan gelek şâ bûyi.
Lew te pirr ji wan hez dikir.
Erê. tu çûyi. Lî ma tu nabêjî ro-

ketavêja min û bikisiya min wê
ci bikin? Qet mitalan neke.
Xwîna te li erdê namîne. He-
valê te ew roketavêja ku te
weke dildara xwe himbêz dikir.
neêxistin destê dijimin. Niha ew
bi hevalê te re ye.

Weke tê gotin. roja çarê A-
darê. te bi hevalan re komicî-
nek çêkiribû. Ji ber qolinc û eşâ
gurçikê xwe. te bi zorê peyva
xwe qedandibû. We bi hev re
biryara livbaziyeke li neqeba
(navbeyna) Nisêbinê û Cizirê
dabû. Roja din we karê xwe kir
li dora Gundikê Hemza kemîn
min...

dani. Hevalê te gelekî rû li te
danibûn. Gotibûn: "Tu nexweşî.
Neyê kemînê." Lî te gotibû:
"Ne gurçik. canê min bi qurba-
na welatê min be. Ku ez şehîd
bikevim. min li nav şehîdên Ba-
gokê bi cih bikin." Dû re te ra-
hiştibû roketavêjê û di kemînê
de cihê xwe standibû. Lî mixa-
bin ew kemîn bû kemîna te ya
dawî. Xemê nexwe Pilingê
min...

Tu niha li cem wan egîdîn
Bagokê di xew de yî. Her sibe
di dilê Jîr Dilovan de tu şiyar di-
bî.

Ma em nikarin xwe binivîsin

Zana Farqînî

Em civakeke wisan in ku. me
xwe bi xwe nedaye naskirin. Em
tér xwe nas nakin. Her çiqas di
van salên dawî de xebatêni bi vî
rengî tê kirin ji. Hê ji em xwe.
civaka xwe. bi hemû alîyan ve. ji
berhemêni kesen biyan û ji
çavdêriyêni wan. nas dîkin. Ev
rews ji bo hemû waran ji eynî ye.

Dema mirov xwe. civaka xwe.
têkiliyêni xwe. danûstandinêni
xwe. tore û kevneşopêni xwe di
berhem û nivîsen kesen biyan de
dibîne carna. mirov mit û mat di-
be. diheyire. Bê çawa ew wan
taybetiyêni me dizanin. Ger ku
nivîskar bi pesin ji me behs kiri-
be. pişike mirov pê mezin dibin.
dinepixin. Berevajî ku nivîskar bi
awayek rexnegirî alîyek civaka
me hildabe destê xwe û nivîsan-
dibe. vêca li xweşa me nayê. Bi-
rû li mirov dibin cot. mirûz tirş û
tal. qermûçek li eniya mirov
çedîbin.


Ciqas li xweşa me were an ji
neyê. em xwe di berhemêni biyan-
yan de dibînin. Her çiqas ber-
hem xwedî kêmâsi û çewtiyan be
ji. Camêr me. ji me rîndtir nas di-
kin. Ev kes berahî û heqîqeta ci-
vaka me di berhem û nivîsen
xwe de. dinivîsin û pêşkêsi xwen-

devanêni xwe dîkin.

Ji van nivîskarêni biyan yet ji
ji. **Murathan Mungan** e. Ev
kes ji Kurdistanê ye. Hema he-
ma hemû berhemêni wî li ser ci-
vaka Kurdan e. Tip û karekteren
ku di nivîsen xwe de bi kar aniye,
hîn ji di nava me de hene. Bi tay-
beti ji. li ser civaka me Kurdan
dînîvîse. heqîqetîn urf û adetîn
me di berhemêni xwe de bi kar ti-
ne.

Navê berhemêni wî ya ku em
dê li serê rawestin "**Taziye**" ye.
Ev pirtûk. berhemek şanoyî (ti-
yatroyî) ye. Mijar (mewzû) li ser
xwîndariyê hatiye honandin û di
qesrê mirov di berhemêni de
dibîne. Di "Taziye" de dijberî û du-
bendiyêni di navbera mirov û urf
û adetan de. xwe bi awayekî es-
kere diyar dike. Dema mirov ber-
hemêni dixwîne. ev dijberî û ge-
lemseyen toreyî (adeti) xwe li mi-
rov ji dipêçin. dilefinîn.

Berhem li ser heqîqetî hatiye
honandin. Minak di pirtûk de.
bi darê zorê. jîna li ber mehrê.
revandin heye. Bedirxan Axa. bi
devê tivingê. Fasla keça Şerko Axa.
ji ber mehrê direvîne û zava
dikuje. Bedirxan Faslayê. ji ber
xwîne direvîne. Vêca tîrsa mirin
dikeve dilê Bedirxan. Dora ku-



Berga "Taziye"

tîne hatiye ser wî. Şerko Axa ji
bo kuştina Bedirxan Axa. rojan
dijimere.

Bedirxan Axa. bi salan bi tîrsa
kuştina xwe dîji. jê re ji Faslayê.
Hêja çedîbe. Bedirxan Axa. tê
kuştin. Diya Bedirxan Axa Diya
Kewser. ser û sebebê kuştina
lawê xwe. bûka xwe ya bextreş
Faslayê dibîne.

Rûspî û giregirêni eşîrê li qesra
Bedirxan Axa li hev rûdînîn. Bir-
yara kuştina Faslayê distinîn. Ê
ku wê ji bikuje û xwîna bavê xwe
ji erdê ji hilîne dê Hêja be.

Hêja zarok e. Li hember vê
biryarê der tê. li ber xwe dide. Lî
çare nîn e. Divê li gorî gerdiş û
toreyê Hêja diya xwe bikuje. Lî
Hêja bê hemd û bê çare ye. Nax-
waze.

Di dawiyê de. di navbera wan
de ev gotin derbas dibin.

Fasla: "Bila destê te melerize.
Hêja! Mîna dara ku li pelên xwe
hikûm dike li piya biskekine."

Hêja: "Heqê xwe li min helal
bike dayê. min dixwest. welatan
bexşî te kim. Ji bextê min re. mi-
rin ket. Ez deynê lawîtiyê wiha
didime te."

Fasla: "Helal be heqê min li
te. xweş helal be. Welatê min.
mirin e ji bo min."

Berhem bi motifên Kurdi hatiye
xemîlandin û arastin. Lî zi-
man bi Tirkî ye. Nivîskar di dema
peyvandina kesan a bi Tirkî de.
zêde bi ser neketiye. Lewre nivî-
skar kesan hem mîna kesen Ereb
û hem ji mîna kesen Kurd ku de-
ma bi Tirkî dipeyivin. ew dane
peyvandin. Devok bi gişî ne de-
voka kesen Kurd ên ku bi Tirkî
dipeyivin e.

Taziye heta niha du car hatiye
çapkirin. Di sala 1982 yan de ji
aliyê Weşanîn "Dost Kitapevi" û
di 1992 yan de ji. ji aliyê We-
şanîn Metîsê ve.

Rewşen nêzî maneya xwe dibe

Kovara çandî Rewşen a Navenda
Çanda Mezopotamya weke her-
car bi Tirkî û Kurdi tevî 62 rûpeli
bi hejmara xwe ya 9'an derket.
Di sergotara vê hejmara de tê di-
yarkirin ku heta demeke din ji
(nayê zanîn çiqas e) ji sê paran
parek wê cih bidin Tirkî lê dawî
wê xwerû bibe Kurdi. Li aliye
din nivîsê vê hejmara bi pirranî
yên lêkolîni ne. Lêkolîna Pierre
Lecoq ku li ser ziman çekiriye bi
sernavê "Rêzkirina Zimanîn İra-
nî-Arı yê Rojavayê" bi wergera
Mamo Cumî ve hatiye nivîsîn. Ev
nivîs ji bo kesen ku bi zimanê
Kurdî ve eleqedar dibin. baldar e.
Lêkolîneke din ji ya Kaya Müş-
takhan e. Kaya Müştakhan di vê

ye.

Ji xeynî van di vê hejmara de
ev nivîs hene:

Bi sernave "Xwîn û Hêstirê
Cavan" niviseke Lokman Polat.
bi Ordixanê Celîl re hevpeyîn.
niviseke folklorik bi Zazakî ya J.
Espir bi ser navê "Ebi Gore Bê
Edetanê Ma Zewac.". Beşir Ant
bi sernavê "Mem û Zîn ya da
Memê Alan.". F. Huseyn Sagnîc
"Zman û Rastnîvî". metna Şâ-
noyê ya Huseyîn Kaytan bi navê
"Mîrin û Jîyan" hatine nivîsandin.
Di beşâ niştîmana xwe binase de
bajarê Erzinganê tê nasîn. Di be-
şâ muzikê de Cemîla Celîl ji tevî
notayê wê "Tuzik li ser ava ye"
nivîsiye.

REWSEN

Kovara Navenda Çanda Mezopotamya

Ebi Gore Bê Edetanê Ma Zewac.	Mem û Zîn ya da Memê Alan.
Espir bi ser navê "Zman û Rastnîvî".	F. Huseyn Sagnîc "Tuzik li ser ava ye".
Ebi Gore Bê Edetanê Ma Zewac.	Mem û Zîn ya da Memê Alan.
Espir bi ser navê "Zman û Rastnîvî".	F. Huseyn Sagnîc "Tuzik li ser ava ye".

REWSEN

Kovara Navenda Çanda Mezopotamya

Çîrok

Rêşan

FENER ROJBIYANÎ

Roj. ji rojên buharê ne. Lé belê hewaya demê ji me re tê xuyan ku ne ew rojên demsala xweşik in. Ji ber ku esmanê Nisêbinê ji ewrên reş û tarî da-girtibû. Axa wê gelek ciçoqe ye. ji ber barana şeva berê. ku gelek baribû.

Ev herî û civloqe nahêle ku. tu kes di nava rê û dirbêN Nisêbinê de bimeşe. Li dûrnêrinê, li bajêr ci çepê rast û ci jî. jér û jor şopên lingên însanan û pêlên dewaran xilç bûne di nava heriye de. Ji me re dide xuyan ku. şerê par lik ve kî hez bû.

Dem derbasî nîvro bû.

Hêdî hêdî nêzîkî riya Nisêbinê ya herî mezin bûn. Piştî we-xereke (sefer) dirêj û dijwar. herdu bi hev re hisibûn ku. zikê wan vala ye û hewcîyi xwarineke xweş û germ in.

Metin bi destê xwe xwaringeha kebabê işaret kir û bi lez di riya ku tê de sekinibûn derbasî rexê din bûn. Û ketin hundirê xwaringehê. Rojnamevana Almanî Petra Leyn. tevi rênisanê xwe ji xwe re maseyekê bijartîn û rûniştin. Petra. kamereya xwe avête ser maseyê û destê xwe xiste çenteyê xwe. Jê tevi paketek cixareya West û hes-tayê sor derxist û cixareya xwe vêxist.

Metin bi xwe ji gundê derdora Nisêbinê ye û yekî bejin zirav û dirêj e. Simbelê wî reş û dirêj. riyan wî bi hevdeyên reş û spî hatiye neqisandin. Li ser serê wî sewqeyeke cûxî ya Tirkan heye. Ew sewqe serê wî yê kecel û lat vesartibû. Metin demekê li Almanya ji bo kar mabû. Metin bi zimanê Almanî yê tevlîhev û sîkestî dest bi axaftinê kir.

- Tu ci bixwazî heye. Şorbennîsk. şorbemast. hemû rengên kebabê hene. Vira ne Stenbol e. Xwarinen Nisêbinê xweş in. paqîj û saxlem in.


Piştî solqekî (bîskekî) ji nû ve gotinê xwe domand.

- Tu xeman mexwe. kar-keren vî cihî hemû Kurd in.

Petra li dorpaşê xwe nêrî dit ku. çend wêne bi diwaran ve daleqandî ne. Yek ji wan pira Stenbolê ya "Bogaziçi" ye û yê din wêneyên cihî turîs-

tîk û deverên kevn in. Mîna Antalya û Bodrumê ne. Di sîn-ga xwaringehê de du wêne hebûn. Yek jê bavê Tirkan Ataturk û yê din jî xwediyê xwaringehê bû. Herdu wêne jî bi gul û çîçkê texbî (plastik) habîbûn xemilandin.

Metin karê wî. rênîşa bajarê Nisêbinê bû. Piştî ku ji rojnamevana Almanî Petra pênc markê Almanî standibû. bi xwe hesibû ku ji erk û karê wî re piçek agahdarî û zanîşweren li ser rewşa bajêr divê. Jî i



b e r
vê yekê ji Metin kete nava hemû rengên gotebêjên ramyarî. civakî û dest bi peyvîn mezin kir.

- Komara Tirkîyê ne weke berê ye. İro pêşketin. wekhevî heye. dadmendi (edalet) heye. demokrasî heye. Va iro ez û tu. em bi hev re bi serbestî di-axivin. İro li ba me. li Rojhîlatê. xwedê ji hikûmetê razî be. ji me re. rî. dibistan vekirine. Binér av û elektrîk jî heye. Berê em di nava tariyê de dijyan.

Petra xwarina xwe hêdi hêdi dixwar û li rûyê Metin dike (zûr) nêrî. Ji ber vê nêrînê rûcîke Metin sor bû. Metin bi şûn ve kişi û di dilê xwe de got: "Min tu gotin bi çewti gotin?"

Petra ji nişka ve rawest. Lé rawestina Pêtra ne ji ber peyvîn Metin bû. Metin heyirî û di dilê xwe de. "Çima ev jînik wîlî kir?" got. Metin hîn di danûstandina hundirîn de bû. Ev di cihê xwe de bû. lê henas (nefes) lê teng bû. ji ber teqînek ku ji derve hat. Kesên di hundirê xwaringehê de gişt derketin derve. Da ku binêrin ci li derve qewimiye. Dengê

hêle hêl û qire cirê ji dûr ve dihat. Dûmaneke reş ber bi ezmanê Nisêbinê ve hildikşîya.

Rojnamevan Petra peyivî û destê xwe dirêjî esman kir.

- Ev balefir e. belê ev helikopter e!!!

Ev ci dike ci qewimiye?

Metin bi ken û henek bersiv da:

- Tu xeman mexwe. Ne min ji te re gotibû ku hikûmet ji me hez dike. Ev balefîra çandîniye. Hatiye ku derman li ser zevî û bexçeyen me biresîne. ji bo ku sewz (zerzewat) û mîwênen me xerab nebin.

Çimki çûk û teyr êrîzi ze-viyan dikin û teneyen mîwêyean dixwin.

Petra bi lez berê xwe da maseyê û dest bi komkirina tiştên xwe yên taybetî kir. Berê xwe da derî û got:

- Metin niha karê me dest pê kir.

Ev balefireke leşkerî ye. Ha binêr ci diavêje? Ew gazên jahrê, gazên firmîsk rijandinê, li ser şeniyen Nisêbinê diavêjin. Metin bi devekî vekirî û bi matmayinê got:

- Waaa.... Dibe ku wilo bîke!!!

Herdu bi hev re bezîn û berê xwe dan cihê ku jê qire cir dihat. Dîtin ku hemû xelkê bajêr. ci bicûk û ci jî mezin derketine ré û dirban. Destê xwe bilind kirine û numereya heftan ji nava pêçiyen wan tê der. Bi yek awazekê bang û hawarê dikirin. Dihat xuyan ku. tiştekî mezin an jî xismek bi ser xelkê bajêr ve hatiye. Metin bi destê xorhekî girt ku jê bipirse bê ci bela bi serê wan ve hatiye.

Mihemed bi hilekiş:

- Em ji goristanê dizîvirîn malen xwe. Piştî me canemergen xwe bi gor kirin. teh-dehiyan li me kirin.

- Çima kuro?

- Sedemê wê jî. çima ku em li canemergen xwe xwedî derketin û me xwest em wan bi şanazî û bi serbilindî bi gor bikin.

Mihemed Elî, bi hilekiş û benasê ku. sînga wî radibû û rûdinişt gotina xwe kuta kir.

Başûrê rojavayê
Kurdistanê / Efrîn

AZADÍ



Abdurrahman Durre

Xaîn kî ne?

X aîn bê namûs in, xaîn bê xîret in, xaîn bê şeref in, xaîn bê wijdan in, xaîn bê iman in, xaîn caşik in, xaîn kûçik in.

Belê xaîn kî ne? Xaîn ew in ku, bi devêñ xwe bi rewşen xwe, bi tewşen xwe, bi dilen xwe, bi milen xwe alîkarê dijmin û dostê neyarêñ virrek û sextekar in, cilq û gemar in.

Di her demê de, di nava her gelî de, xaîn pirr bênamûsî û bêşerefiyê mezîn kirine û hê jî dikin. Dawiya wan jî tim û tim rezîlî û riswatî bûye. Qehr û xezeb li wan hatiye, dê ji vir û wiha de jî wilô be.

Şairekî Kurd der heqê xaînekî Kurd de, bi zavarayê (lehca) Soranî wiha dibêje:

Eger kûyê diya xwe, yan jînekey bixwara
Şaş ned'kîri riya xwe, ned'çû li pey neyara

Bi rastî jî ew şairê hêja pirr rast gotiye. Ew kesê ku xaîntiya gelê xwe dike û dibe kûçikê neyaran, ew yê diya xwe, jina xwe û hemû alemê tevî bixwe, pirr ji wê xaîntî û bênamûsîtiya wî çêtir e.

Gelê Kurd jî iro, têkoşîna azadî, rizgarî û serfirazîtiya xwe dide. Li hemberî dijmin û neyarêñ demokrasî û mirovatî û heqnasîtiyê dimeşîne û di dawiyê de wê zefer jî ya wî be.

**Di dîroka cîhanê de heta
îro têkoşîna tu gelî bêen-cam nemaye û namîne, gi-hîştiye zefer û serfirazîtiyê. Tu şik û şubhe tuneye ku têkoşîn û serhildan û şoreşa gelê Kurd jî bêencam namîne, wê bi xemla azadî û zeferê bê xemilandin û tackirin. Caşik û xaînên gelê Kurd jî wek hemû caş û xaînên cîhanê wê rezîl û riswayê alemê bibin.**

hanê de heta iro têkoşîna tu gelî bêencam nemaye û namîne, gi-hîştiye zefer û serfirazîtiyê. Tu şik û şubhe tuneye ku têkoşîn û serhildan û şoreşa gelê Kurd jî bêencam namîne, wê bi xemla azadî û zeferê bê xemilandin û tackirin. Caşik û xaînên gelê Kurd jî wek hemû caş û xaînên cîhanê wê rezîl û riswayê alemê bibin.

Hz. Muhammed dema ku ji ber zâlim, xwînxwar û barbarê Mekeyê koçî Medîneyê dike, bi hevalen xwe re nêzîkî bajarê Medîneyê li Qûbayê dicivin, li ser stratejî û planen xwe yên nû disekinin. Riya xebat û lebata xwe didin kifşkirin ku, ew der bibe qerageha şoreş û serhildana wan. Bi navê Mescîdetteqwa li wir mizgeftek jî tê çêkirin. Minafiq, sextekar û xaînên wê demê jî li hember wê şoreş û serhildana şeref û namûsê ku Hz. Muhammed û hevalen wî dimeşandin, radibû û li hemberî wê mizgefta wan a pirr bi rûmet û pirr bi şeref jî mizgeftekî din çedîkin. Meqsed û xaya wan ew bûye ku, dubendiyê çebikin, şoreş û serhildana İslâmê û Hz. Muhammed bidin pelişandin û xerabkirin.

Teşbih durust be, li hember şoreş û serhildana gelê Kurd jî minafiq û sextekar û xaînên gelê Kurd jî, ketine fealiyetê; Qerargeh û civat û komên minafiqi û xaîntiyê çedîkin û bi dijmin re dirêsin û dipelpitîn, agir û pêt û şewata xaînî û bênamûsiyê ketiye nava can û bedena wan. Belê heyhat û heyhat dawiya bê namûsîtiyê bê şerefi ye.

Xewn, di jiyana mirov û civanan de cihekî pirr girîng nagire! Xewn, di zanistiyê de: şewqa jiyana ku tê jin, di xewê de ditin e. Bînîşîn (bilincâltı) e. Mirov dikare ji bo xewnê bibêje ku, dîtina xewnan hebekî jî, di desten mirovan de ye. Ji ber ku mirov ci mijûl bibe ew tê xewna mirov. Mirovekê di nava xweşiyê de xewnen xweşiyê dibine, mirovê di nava nexweşiyê de, xewnen nexweş dibine. Ji aliyejî ve jî, xewn weke neynika mirov û civakê ye!

Civaka Kurdan jî, bi her a-wayê tê guhertin, di nava van guhertinan de xewn jî heye. Jiyana mirovan, li gorî şertên (mercen) aboriyê dikeve şeklekî. Li gorî vê aboriyê, şertên konevanî (siyasi) û çandî jî tê holê. Pêşketin yan jî paşmayîna aboriyê, seranser li ser van babeten din jî, bandora xwe dihêle. Bi yekbûna van şertan, raman û jîyan jî, di binê vê bandorê de dimîne. Gorî ku xewn, şewqa jiyana mirova ye, ew jî wê di binê vê bandorê de bimîne.

Kurd bi her awayî, li gorî ku ewqas li paş maye jî, zû tê guhertin. Ev guhertin helbet ne bi serê xwe ye. Berî her tiştî, têkoşîneke pirr dijwar li welêt heye. Ev têkoşîn, li ser Kurdeki/ê bandorekê dihêle. Cihê vê bandorê, li gorî çîna kesan an baş e, an jî ne baş e! Lê tiştikî qetî heye ku, ew jî, bixwaze an nexwaze di binê vê bandorê de ye.

Berî têkoşîna iro, gelê Kurd, di xewnen xwe de li gorî jiyana xwe, xewn didit. Ger gundi bûna; pez û rez, ger bajarî bûna; jiyaneke hîn xwestir, dukan û meqam, ger sultane bûna, xelas kirina dibistan û standina dîplo mayê ger... difikirî.

Xewnen Kurdan

Kurd bi her awayî, li gorî ku ewqas li paş maye jî, zû tê guhertin. Ev guhertin helbet ne bi serê xwe ye. Berî her tiştî, têkoşîneke pirr dijwar li welêt heye. Ev têkoşîn, li ser Kurdeki/ê bandorekê dihêle. Cihê vê bandorê, li gorî çîna kesan an baş e, an jî ne baş e! Lê tiştikî qetî heye ku, ew jî, bixwaze an nexwaze di binê vê bandorê de ye.

Belê iro, ew gundiye ku rez û pez difikirî, ew bajariye ku li dikan û meqaman difikirî û ew suxtayen (xwendekar) ku li dibistan û diplomeyan difikirîn, nema wana weke armancekê difikirîn û her diçê dev ji wan ramanen berê, ber didin û xwe ji wan xelas dikin. Ji ber'ku armancen xwe yên eslî fîr bûn, ji ber ku jîyan xwe guhert û ji ber ku riya ku wê tê de bimeşe, dit.

Ew gundiye ku kes pê ne qayil bû, iro di xewna xwe de, xwe di qada cengê de dibine, bajarî û esnafêndi Kurd, rojîn azad û serbixwe di xewnen xwe de dibînin. Û xorten ku di xewnen xwe de hew evîna keçen cîranen xwe didit, iro di xewnen xwe de, qumandariyê dibîne û dibe qumandar jî.

Berê, gava ku Kurdeki ji xewê şiyar dibû, berî dest bi xewna xwe bike, yên dora wî digotin. "Xêr be înseleh, te tiştikî nebaş nedîtibe." Dicûn cem şex û meleyen xwedî xistîk û tizbi, rih bi qirêj, sextekar û ew û wijdanen xwe diman, cawa şirove (tabîr) bikiran, wê bikiran û pere, mirîşk û dik wê bidana wan pirr i caran di van xewnen xwe de Kurdan ji bo ereban di şerrê kafir û munafiqan de bûn, geh şehid dibûn û geh jî gazî! Lê qet di xewnen xwe de, ji bo xwe şer

ne dikirim!

Ditina van xewnan, rewşa Kurdan a resayî, xweş tîne ber çavén mirov, iro hem xewnen Kurdan û hem jî rewşa Kurdan ji binî ve hatine guhertin.

Xewn, di jiyana gelê ku baweriya xwe bi olê (dîn) anîbe,

cihekî cidî digire. Gelê Kurd hem baweriya olê û hem jî baweriya şoreşê di rih û canê xwe de his dike. Ji ber vê yekê, di demeke kin de xewnê Kurdan jî, weke rewşa wan girikî bû. Lê iro ev girikbûn her diçê zelal dibe. Zelalbûna xewnê jî, bi pir-

ranî li ser şoreşê ye. Çima ku gelê Kurd, bi pêşengiyâ xwe re, bi gavên bawerî, ber bi şoreş ve dimeşe. Her avêtina gavekê, zelalbûna xewn û rewşa Kurdan e. Kurd, di xewnen xwe de êdi nema diçin cem şex û meleyen sextekar, reste rast diçin cem pêşengiyâ xwe û xewna xwe ji pêşengiyê re bê mirîşk û dik dibêje! Û ji her xewna xwe, mizgîna pêşerojek azad derdixe.

Me gote ku xewn, bînîşîn e. Bînîşîna Kurdan, iro her gav dibe serhişîna! Û vê zanibûna xwe ne li gorî menfeeta şexsî, li gorî menfeeta neteweyî dixebeitfine, êdi kî dikare vê zanînê jî serê Kurdan derxîne?

I. Xort

Kes şûna kesî nagire

M. Dewran

Her kesî ku ci kes be, şûneke wî yê taybet û nasyar heye. Bawerî û çavén wî bi mejîyê wî ve, bi awayekî endaze tete girêdan... Mejî-hewas, rewş û serpêhat tev lêborîn û gîhrînê sext û umrê cur be cur, wisa di gel xawandina hemdemî, ilhamî ji xweberê, li gor van wate û nevşen jorîn, şûna kesan tene pêhesandin û tene pesandin...

Heke em jiyana nivîskaren dem û dînyayê berçav bikin û li berhem û bîr û ramanen feylesof û hozanen efsane û desstanan mîze bikin, qet çend kesan weke hev bi mejîyê nabinin!

Di diroka gelan û miletan de, di peydaîûna dîn û diyantetan de, yan di jiyana qîral û

padîşahan de, heta kesamendên mezin(!) ên wek pêxemberan hatine wicûdê, disa kesî şûna kesî negirtiye... Her kesî li gor mejî û zeman û pêzânîna xwe gotî û kiriye... Li dawiyê, şûna wan bi hikmê serdem û zemanan kavîl û şikîr bûye. Heta bilbilê Xabûrê, wek yê li ser Avahevrenge awazan naxwîne.. Li gor xuş xuşa pêla çemê xwe, awazên xwe dixwîne...

Lê şehîden ji bo azadiyê, nivîskar be yan cotyar be, jîn be yan mîr be, şûna wan vala namîne, nav û jiyana wan temam nabe, canên wan wek stêrkêن ges di nava zeman de winda nabin. Şûna wan bi vi awayî, tene girtin!. Belê, Şehîdê Kurdistana fireh! Musa Anter hate kustin bi destê dijiminê neteweya Kurd, bi qed

û merema, ji wê neteweyê, bêpar û mehrûm bike û şûna wî, di déhat û meydana xebatê de vala bihele.

Gelê Kurd, tev komîte û hejeta zana û nivîskaran, xwe kîşandin wê şûnê dawiyê bû, lehî û halek sermedî û ezeli! Bû şerefek mezin û bilind, bi avik xwînavî, di sicîla neteweya Kurd de navê wî hate neqîşkin û tomarkirin... Bext û textê Amedê, pê ve jî û spî bû...

Xwîna Musa Anter hate rétin ji bo azadiya mezin! Ji bo xweşî û bextiyariya ji yên paş xwe re! Ez vê rûpelê, bi rondikên çavén xwe diyarî şînnama wî dikim û li dawiyê dibêjim, bijî Kurd û Kurdistan...

Vejin canên sehîden Kurdistanê... Vejin şehîden ji bo azadiyê.

XACEPIRS

Çeperast: 1-Helbestvanê Kurd. Navê wî yê rast Nayîfê Hiso ye. Di sala 1923'an de, li Qamişlo hatiye dinê. Helbesta wî ya 'Bilbilê Dilşad' pirr bi navê û deng e. Di wêne de tê dîtin 2-Dîn / Yarîmetî, alîkirin 3-Şertek ji dînê İslamiyetê yê bingehîn / Navê dewletek dagirker ku Kurdistanê dagir kiriye 4-Mewzû, da-baş / Serbest, hurr 5-Emîr, prens / Di kîmyayê de navê gazekê / Arvan, ard 6-Int, irn / Sembola Bromê 7-Aletek şer / Navê dewarek ku pê cot dikin 8-Agîr / Mirov serîşk, bi inat 9-Torbe, çente / Daçekêk neyîniyê 10-Çarşî / Zîv
Serejér: 1-Pêlav, şekal / Miras, pêma-yî 2-Fêrbûn, hînbûn / Ûris 3-Mirdar / Rûcîk, sûret 4-Berevajîyê kin / kevirên hidûd an jî, ji yên poligonê re tê gotin 5-Êş / Dayîk, dê, pirranî ji bo heywanen mî re tê gotin 6-Baneşanek / Xwedê (Bi Erebî) 7-Eşîri / Endamî (Jî bo bedenî mirov) 8-Navê paytexta Arnavûdê / Sebir, hedan 9-Jî bo nekirinê tê bîkaranî, fermanî tê de heye 10-Navek jinan 11-Raweya tewanbariya agir / Yadê 12-Jîyan, hayat

Amadekar: Rasto Zîlanî



BERSIVA XACEPIRSA HEFTIYA ÇÜYİ

Çeperast: 1-Zekîye Alkan 2-Asit / Zîtol 3-Nî / Adar / Raye 4-Ira / Ir / Amraz 5-Stranbêj / MTA 6-Tîş / De 7-Înayet 8-Merc 9-Mey / Asa 10-Mat / Anîn
Serejér: 1-Zanistan 2-Eşîrtî / Ma 3-Kî / Arşimet 4-Îta / Ney 5-Dîndar 6-Ezârbeycan 7-Aîr / Si 8-Lt, Ajotvan 9-Korm 10-Alarm 11-Yat 12-Ceza

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînin:

Li derive: Y. Serhat Buçak

İş Bankası Cağaloğlu Sub.

Döviz tevdîat Hesap No: 3113617

Li Tîrkiyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok.

Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercen abonetiyê:

Li hundir	Li derive
6 meh	120.000
12 meh	240.000

Rasto û Xwaro

Hebû nebû, rehme li dê û bavê min û we bû. Du hevalê hev hebûn. Navê ye kî Rasto, navê yê din Xwaro bû. Meyla xwe dabûne hev û bi hev re digerîyan. Ê ku navê wî Rasto bû, tim digot: "Rasto bi rastiyo, Xwaro tim darê şikestiyo." Ji ber vê peyvê Xwaro di nava xwe de jê digeherî.

Rojekê herdu bi hev re derketine nêçirê (seydê). Li navsera çiyakî, tî bûn. Çavê xwe gerandin. Bireke avê dîtin. Xwaro di dilê xwe de got: "Edî ezê bi hinceta avê, wî berdime bîrê. Bila di bîrê de bimîne û bimire. Bê ma raste "Rasto bi rastiyo, Xwaro tim darê şikestiyo."

Cûne ser devê bîrê.




Xwaro got: "Ka vî werisî li noqa (newq) xwe bipêce. Ezê te berdime bîrê, avê ji me re derîne." Rasto bi lez weris li noqa xwe pêça û xwe dehlende bîrê. Pişti ku av vexwarin, Xwaro got "çelp" û weris bi duv de berda bîrê. Got: "De bimire vêca." Rasto got: "Gidî... Em heval in." Xwaro got: "Edî ezê rastîtiya te bibînim."

Xwaro ew hişt û berê xwe da mal. Pişt re bi çend xebera şeytan û gur û rovî hatine ser devê bîrê. Şeytan got: "Min qîza Mîrê vî welatî dîn kiriye. Ku axnê ji ya hundîre vê bîrê bavêjine rûyê wê, wê rehet bibe." Gur got: Min ava vî gundê hanê girtî

ye. Min fersek kiriye devê kaniyê. Ku jê derxin, wê av biherike." Rovî got: "Min di vê şikêra hanê de şerbikek zêr hilandiye (vesartîye). Her roj ez wan di hejmêrim û dîsa dixim cih."

Rasto dengê teva kir. Pişti ku ew çün, dît ku şivanek hate ser devê bîrê. Dewla xwe dehiende bîrê. Rasto bi lez mîstek (çenget) ax ji bîrê kire berika xwe û xwe zer kire dêwlê. Şivan şas bû. Got: "Tu ci kes i?" Rasto got: "Hal û mesela min ev e... Min derxe. Ezê hevqas zêr bi te dim." Şivan bi lez hilkişande banî û derxist. Rasto çû şerbikê zêran derand. Deh zêr da şivên û yê din birin. Çû gundê ku ava wan xitimandî. Gote gundiyan: "Bi min re werin. Ezê ava we biherikînim." Gundî pê re çün. Ferş ji ser devê kaniyê rakirin û ava gund herikî. Gundiya geleki hez jê kîrin. Pişt re berê xwe da bajârê Mîr. Bi nava bajêr ket û ban kir got: "EZ nexweşan rehet dikim. EZ dîna dirust dikim." Xeber giha Mîr. Gotin: "Yek hatiye. Dibêje, "EZ dîna dirust dikim." Mîr çend zilam şiyandin û Rasto anî hizûra xwe. Got: "Lawo gelekan weke te gotin emê rehet bikin. Lî teva serê xwe



dane jêkirin." Rasto got: "Min her tiş qebûl e." Mîr da pêsiya wî. Got: "De were, em herin." Hingî keçik har e, kirine pişta heft deriyan. Yeko yeko derî vebûn. Çaxê deriyê dawî jî vebû, keçikê weke basokê xwe avête wan.

Rasto axa berika xwe deranî û avête rûyê keçikê. Keçik bû weke şima Got: "Ka cilên min bînin. Ez li xwe bikim." Kêfa Mîr gelekî hat. Roja din delêli berdan nava welêt. Got: "Daweta keça min û Rasto ye. Gelê min hemû vexwendî ne."

Xeber giha guhê Xwaro. Got: "Ka ezê herim. Ne ew di bîrê de bû. Çawa derket û çilo bi keça Mîr re wê bizewice?" Xwaro hat nêri ku rast e. Rasto bûye zava. Qedr û qîmetê ku pê didin nayê gotinê. Xwaro got: "Ne

min tu di wê bîrê de hiştibû. Tu çawa derketi? Rasto got: "Hal û meselê min û wê bîrê ev bû... Ew bîr bi sehîr e..."

Xwaro lê xist xwe avête bîrê û ma li benda sêhîr ku ew jî bibe weke Rasto.

Şeytan û gur û rovî dîsa hatine ser devê bîrê. Şeytan got: "Keça Mîr rehet bûye. Hineka ax ji vê bîrê birine û avêtine rûyê wê." Gur got: "Ava gund jî diherike. Ew jî, ji vê bîre gihayê." Rovî got: "Şerbikê min ê zêran jî birine. Ew jî, ji vê bîrê ye." Hersêka gotin: "Ka naxwe em vê bîrê bi keviran dagirin. Ev bîr ji me re bela ye." Hersêka bîr bi keviran xitimandin. Xwaro di bin keviran de ma û mir.

Car din derket ku "Rasto bi rastî ye, Xwaro tim darê şikestî ye."

Berhevkar: J. D.

xwe li erdê, li mişka digerîne. Dû re çavê wî li mişkê hevalê beqê dikeve. Teyr bi eşq û geş quj dibe erdê, wek birûskê radihêje mişk, bi nûlkê xwe yê zexim digere û li ezmanan dixe.

Çawa ku mişk di devê teyr de li ezmanan dikeve bi benê lingê wî ve, beq jî li hewa dikeve. Lingê wî jor, serê wî li jêr bilind dibe.

Beqên di nava avê de bang dikine beqê hewatî:

- Wa pismamo ev ci heval e, tu dicî ku derê?

Beq poşman û pozide ji qewmê xwe re dike gazin û hewar.

- Gelî pismaman, ê ku weke min, qewmê xwe, rejê xwe û hempayê xwe re nebe alîkar, wiha weke min wê lingê wî li hevraz û serê wî berjêr bel...

Berhevkar: Ahmet Hocaoğlu

Mişk û Beq

Mişk û beq bûne destebi-rakê hev. Dil dikin ku qet ji hev neqetin. Hez dikin tim alîkariya hev bikin.

Lê belê mişk, li reşayê, beq di nava avê de dijî. Carna beq ji nava avê derdikeye, li dora avê ew û birakê wî yê mişk hev dibîn, ji hev re dipeyivin (şor dikin) û bi hev re mijûl dibin. Lê belê beq, nikare pirr ji avê derkeve.

Rojekê mişk difikire û dibêje beqê.


- Birako bi vî awayî em nikarin alîkariya hev bikin. Carna ez nêçirêne xweş digirim, dixwazim ku bi tevi te bixwim. Carna tu digirî ez pê naheşim û ji fêde nastînim. Were em bi benekî dirêj, bi serikî lingê te, bi serikî lingê min girê bidin. Ez

ku xwerekekî bibînim, ezê ben bikişînim, gazî te bikim. Tu jî bibînî ben bikişîne ez pê bihesim. Carna dilê me gili gazin û sihbetê jî bixwaze emê ben bikişînin.

Ev yek kete serê beqê jî. Bersiva mişk da.

- Belê birako tu rast dibêji, em wek gotina te bikin.

Herdu bira benekî dirêj,



Ji bo xwendevanê me. ji kema
rema xwe re hûn dikarin xwe
bidin naskirin?

- Ez sala 1941'î li Ermenîstanê, li gundekî Kurmancan pala Çiyayê Elegezê, di Gundersazê de hatime dinê. Min xwendina xwe pêşî li gund, paşî jî li bajarê Yêrivanê temam kiriye. Niha li vir, li enstituyeke ilmî serwêrê parê me. Hîna zarak bûm, min helbest diniyî. Berhevoka min a pêşin "Şi-verê" di sala 1965'an di li Yêrivanê neşir bû. Pey re, çend pirtükên helbest, çîrok û şanoyan min neşir kirine. Niha li bajarê Alma-Atayê em kovareke çandî, dîrokî, kultûrî, derdixin. Navê wê "Kurd" e. Heta niha sê hejmarêne wê derketine.

Li gora we, rola edebiyatê ci ye, di pêşveçûna civakê de, divê edebiyat ci rolê bileyiz?

- Di pêşveçûna emrê (temenê) gel de rola xebera bedewtiyê pirr e. Nivîskar wekîl û xulamê gelê xwe ye.

Nivîskarê esil, qelp nabe, dengbêjê kul û derdê gel e, dengbêjê xwestin û meramê wî ye, lê nanihêre gotina wî li kî xweş tê li kî xweş neyê: ew rastiyê dibêje. Di afirandina wê de, rastî ji gel re dibe kilama azadî, serbestî û serhildanê, dibe beyreqa (ala) pêşveçûyînê.


Gelê Kurd rihsivik e. Ew ji kilam û afirandinê bedewtiyê pirr hez dike. Zargotina me pirr dewlemend e. Miletê me ew zargotin afirandiye, niha jî diafirîne. Ew kaniyeke gurr e. Pirr milet jî wê kaniyê avê hildidin, lê kanî namiciqe (naçike).

Rola nivîskar û edebiyatê niha êdî pirr e di jiyanâ gelê Kurd de. Hemû afirandinê nivîskarêne Kurd in ku, digihîjin gel û dibin hebûna wî.

Xebatê çandî li cem we di ci rewşê de ne? Sistema Sovyetê ci derfet û astengî derxistin pêsiya we û di wê demê de, rewşa we ji aliyê civakî, aborî, siyasi û çandî ve çawa bû?

- Rewşa çanda me li hemberî berê ne ewqas pak e. Nivîsarêne me neşîr nabin, mical kêm in. Hilşandina (hilweşandin) sistema Sovyetê, gelê me di nava wan welatên mezin de belav kir. Gelek jê, ji warê xwe yê berê şihatîn, halê wan ê aborî jî xerab bû. Rewşenbîr ketine halê aboriya xerab. Rojname û kovarene ku niha li cem me neşîr dibin, di halê pirr çetin de ne. Mical kêm in. Dewlet alîkariyê nake. Di welatê Sovyetê ya berê de rojnameya "Riya Teze" (Kurmancî) li Yêrivanê, "Dengê Kurd" (Kurmancî) Li Bakuyê "Roxoc

NIVÎSKARÊ KURD ESKERÊ BOYÎK



'Divê em zimanê xwe ji hepsê derxin'

Nivîskarê esil, qelp nabe, dengbêjê kul û derdê gel e, dengbêjê xwestin û meramê wî ye, lê nanihêre gotina wî li kî xweş tê li kî xweş neyê: ew rastiyê dibêje. Di afirandina wê de, rastî ji gel re dibe kilama azadî, serbestî û serhildanê, dibe beyreqa (ala) pêşveçûyînê.

HEVPEYVÎN: M. ROJAVA

KYP II A" (Rûsi) li Moskovayê "Kurdistan" (Rûsi) li Alma-Atayê. Kovara "Kurd" (Kurmancî, Rûsi) derdiketin. Hem micalen wan ên teknikî hem jî yê aborî kêm in. Lî di her micalî de xebatê wan ên neşîrkirinê nasekinin.

Hûn wek Kurdên Welatê

Şêwrê (Sovyetê) iro di ci rewşê de ne, hûn di kîjan şertên civakî de dijin?

- Ez jî mirov û nivîskarekî wî welatî me. Wek wan em jî, li hêviya rojêne xweş in.

Tekiliyên Kurd û Ermenîyan çawa ne?

- Kurd û Ermenî tim cîranêne

herî qenc, bûne, tevdî jîne. Di şertên dijwar û çetîn de, jîne. Rind hay ji kul û derdêne hev hebûne, problemen wan yek in.

Salen dewleta Sovyetê yênderbâsbûyi, dane kifşê ku pis-mamtiya herdu miletan mehkem e. Çimkî tenê di Ermenîs-

tanê de, ji Kurdan re micalê pêşveçûyînê, medeniyata milet hebû û iro ji hene. Niha jî herdu milet tev (bi hev re) dijin û çetîniyê iro yêne mezin hel di-

kin.

Li ser rojname û kovarene bi Kurdi, li welêt û derveyî welêt derdikevin hûn ci difikirin, ji aliyê ziman û rojnamevaniyê ve hûn ci kîmasiyan di wan de dibînin?

- Şikirbûyîneke mezin e ku, niha di dînyayê de gelek rojname, kovar û pirtükên Kurdi neşîr dibin. Fejet hindik dikevine destê min. Her cara ku ji wan yekê distînim, ji min re eyd û şabûneke mezin e.

Kîmasi hene, ev tiştekî taybeti ye. Tiştên ku teze dest pê dikin, bê kîmasi nabin. Bi texmîna min, em gereke ne ku tenê bikevine pey dîtina kîmasiyan, lê alî rastkirina wan binin.

Meramê me tevan gerek ew be ku, milet bidine serwextkirin ku bi zimanê xwe xeber bidin, zarakan bi zimanê dê hînî xebordanê bikin. Ew iro ji me re problemeke biçûk nîn e. Em zimanê xwe gerek e ji "hepsê" derxin.

Ji bo yekitiya zimanê Kurdi ci pêşniyar û ditinêne we hene?

- Cend zaravayê-Kurdi hene, tev jî di nava dewr û zemaman de dewlemed bûne. Xûn û qinêta wî para gel in, bi kîjanî xeber didin, bi wan zargotîneke delal heye. Texmîna min, niha jî paşwextiyê jî ew zaравe giş wê bi pêş ve herin, bi hev re, bi alikariya hev dewlemed bibin. Bi texmîna min, niha danîna pirsa yekitiya zimên zû ye û şaş e, bi xesarê, zaravayekî bilindkirina zaravayê din ne caiz e.

Li ser têkoşina ya li bakurê Kurdistana hûn ci difikirin?

- Dewr-zeman merêm xwestin, xewn û mitalê me her Kurdeki ew bûye ku, em jî bibin xweyê (xwediyê) nav û nîşan, ax û dewleta xwe. Ji bo vê merêm, me weke cemê Dicle û Feratê xwîn rîtiye. Em ji tu miletî re xerabiyê naxwazin, azaya (azadiya) tu kesî jê bistînin. Em azaya xwe dixwazin, em walatê xwe dixwazin, tevî cîranêne xwe bi dostî, biratî wekhevîti, qedirgirtina kesîna miletî bijin.

Li Kurdistana Bakur, miletê me bi xwîna xwe, ji xwe re rîvedike. Min bêhna xwe girtiye, bi hesret, bi tirs ji dûr ve lê dinîhîrim.

Em tev gere alikariya wan binin.

Ez guman im....

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rue G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ

welat